

## Zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin

Geli Kurdan!

"Heke hûn naxwazin ji hev tar û mar û winda bibin, berî her tiştî, zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.

Lê heke dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin; û bi hevalî û dostaniya milêtên din re pêş ve herin; û bi rûmet û serbilind bijin, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin."

Dr. Nûreddîn Zaza

Parlamentere serbixwe Nizamettin Toğuc dipirse:

# 'Isal di bin çavan de çend kes mirin?'

- Hêzen dewletê her roj li Kurdistanê bi ser gundan de digirin, welatparêzên Kurd ji malên wan derdixin û dikujin.

Parlamentere Batmanê, yê serbixwe, Nizamettin Toğuc roja 4'ê Nisanê hejmarek pirs di derheqê Mehmet Yilmaz û Agit Salman, welatparêzên bin çav de hatin kuştin, de bi daxwaznameyekê rîzkir û da serokatiya Meclîsa Tirk a Neteweyî (TBMM)

Di daxwaznama xwe de dixwaze

## Li gundê Aco ci bû?

Hêzen dewletê, li ser gîfîkirina noke-rekfî, di 3'ê Gulanê de nêzîkê hezar esker, 2 helikopter û bi çend tankan ve çarmedorê gundê Aco digrin. Aco gunde kî Hezo (Kozluk) ye. Hêzen dewletê agahdarî digrin ku li vê gundê 5 gerilla yêjin hene.

Lê li gor gotin û agahdarîyên gundiyan, ev 5 qîzên han bê çek têne gund, li ser pirsa Kurd bi gun-diyan re guftûgo û sohbet dikan; bi hatina eskeran re ji gund derdikevin û diciñ. Hêzen dewletê, weke baranê agir direşînin ser van qîzan. Gullebaranê hêzen dewletê, qasî 2 saet dom dike. Ji qîzan 3 kes têne kuştin û 2 jî bi birîndarî dikevin destê hêzen dewletê. Eskerên Tirk li vir şivanek jî dikujin û cendekê wî jî datîn ba cendekên qîzan; bi vî awayî, vî şivanî jî weke 'terorist' dijar dikan.

Rûpel 15

**Li gundê Aco dewletê senaryoyek bi kar anî. 3 qîz û şivanek qırkırin.**

**Xeber ji gundîyen di bin çavan de nayê standin.**



Dewlet, ji cinazên gerîlayen Kurd ditirse. Wexta gerilla têne kuştin ci-nazên wan dîavêje çalan. Lê gel, li şervanên xwe xwedî derdikeve. Cinazên wan ji çalan derdixe û goristana ji wan re çêdiye. Kulîlk û sosin il ser tîrbîn wan geş dîbin.

Her aliye welatê me Bekaa ye Hêvi Can

Rûpel 4

Ji bo azadî û rizgariyê, du milyon Tirk û milyonek Kurd bes in

M. Ali Tüysüz

Rûpel 5

**Rewşa Gel**  
A. Dîkîlî

Rûpel 8

Ji Nelson Mandela re nameyeke vekirî

Mihemed Farqînî

Rûpel 9

## Êrîşen hêzen rizgarîxwaz ges dîbin

- Bi germaya havînê re bergeheke fireh li ber têkoşîna hêzen rizgarîxwaz vedibe û ev têkoşîn di her qada jiyanê de xwe pêşvetir dibe, kulîlkên sor di axa welat de vedibin û dibişirin

Havîn nêzîk dibe. Hênikaya kirin. Ji gerillayan kuşî û bibuhare cihê xwe hêdî hêdî ji germa havînê re dihêle. Xwîna rihîn candaran germ dibe û dikele. Êrîşen hêzen rizgarîxwaz jî, geşir dîbin.

Gerillayen ARGK ê, di 1'ê Gulanê de, li Farqînê ênîş birin ser eskerên Tirk, ji wan 6 kes kuştin û 12 kes jî birîndar

birîndar nînin. Ev eskerên ku hatin kuştin, ji tabûra 'komando' ya taybetî bûn.

Gerilla roja 3'ê Gulanê, êrîş bire ser Hezexê, dezgehê dewletê yên leşkerî û qere-qolên polîsan bi çekên giran û bi saetan kutan.

Rûpel 15

## Bang ji mirovahiyê re!

- 'Dewleta Tirk şerê taybetî yê ku li hemberî gelê Kurd da-jô, firehtir û dijwartir dike. Me ji di girtigehan de weke rehîn digre. Hêzen kevneperek û otomomîxwaz ên Kurd, li dijî şoreşa Kurd bikartîne'

Rûpel 15

## ROJEVA WELÊT

### Panturkîzm, Tirk û Kurd

S erokwezirê dewleta Tirk Süleyman Demirel pişti serdaneke Ş şerşoju ji Cumhûriyeten Kirgîzistan, Kazakîstan, Turkistan, Ozbekistan û Azerbeycan vegeriya.

Ger û serdana van welatan besta dilê Demirel, Alpaslan Türkçe û heyeta bi wan re rakiriye,

Rûpel 15

## REWS

Abdullah Keskin



## Edebiyata kevn

Dîroka edebiyata kurdî pîr kevn e. Xeba-ta lêkoşinê, ku li ser edebiyata kurdî a kevn çê dibin, gelek hozanê ku hatine ji bûrkîrin, derdixin holê û bi vî awayî xeziñeke edebî derdikeye. Berê hozanê Kurd ji weke hemdemê xwe bi şeklê arûz pirtûkên xwe di-nivîsandin.

Di nav hemû neteweyê rojhîlat de ev adet hebû. Ji Firdevsî heta bi Fûzûlî, ji Feqiyê Teyran heta bi Melayê Cizîrî gelek hozan şîrê xwe di dîwana de kom dikirin. Gelek hozanê bênav hebûn û bi sedan dîwan hatibûn çapkirin. Lî ji vê çandê, ji vê edebiyatê çi maye? İro em çend hozanê Kurd dizanin, çend dîwanê kurdî hene di destê me de? Ji bo bersîva vê pîrsê hê wext zû ye.

Berê li Kurdistanê gelek pirtûkxane hebûn, zêde medrese hebûn. Her pirtûkxane dagirtibûn. Medrese li her çar aliye welêt belav bûbûn û her medreseyek weke pirtûkxaneyekê bû. Li van medreseyan tedrisat bi zimanê kurdî dibû. Dîwan û hemû

pirtûkên din bi kurdî dihatin nivîsandin û çap-kirin. Gelek ji wan pirtûkxanan hatin şewitan-din, talankirin. İro gelek ji wan medreseyan hatine girtin. Yen mane ji îro yekbiyek têñ gir-tin. İro gelek pirtûkên ku bi kurdî hatine nivî-sandin dibin destê me de nînin, pîr ji van pirtûkan winda bûne.

Ji bo edebiyateke hemdemî gereke dîroka edebiyata kurdî a keven were naskirin. Lewre edebiyata hemdemî wê li ser vê mîrasê bilind

*Di pirtûkên ku ji alfabe erebî vegerandine latînî de xeletiyê pîr mezîn hene. Ji Mem û Zîn bigrin heta bi dîwana Melayê Cizîrî di gelek pirtûkan de em rasî van xeletiyân dibin. Ji ber çî? Ji ber ku ev metod, metodeke çewt e. Metoda rasî ew e ku pirtûk di berçaviya akademiyekê an ji enstituyekê de weke xwe werne çapkirin*

bibe. İro li Ewrûpa, Tirkîye û gelek cihêñ din pirtûkên li ser dîrok û edebiyat û çanda Kur-dan têne çapkirin. Lî di vê xebatê de xeletiyân pîr mezîn dibin. Gelek nivîskar û ama-

dekar van pirtûkan li gorî bîr û baweriyêñ xwe diweşîn. Ev tiştekî zêde çewt e. Dîrok û çanda Kurdan bi vî awayî hem nayê naskirin hem ji zêde tiştek lê zêde nabe.

Weke tê zanîn berê zimanê kurdî bi alfabea erebî dihate nivîsandin. Ev 50-60 sal in em bi alfabea erebî amel dikin. Ji alîkî alfabe hate guhertin, ji alîyêñ din zimanê kurdî qedexe kirin. Li Kurdistanê bi tîpê Latînî zêde tiştek nedihate nivîsandin. Pirtûkên kurdî yên berê hemû bi alfabea erebî hatine çapkirin. Hinek dengen di vê alfabe erebî de, di alfabea latînî de nînin. Hin tîp ji hene bi du awayî têne xwendin.

Ji bo vê yekê di transkripsiyana wan tîpan de xeletî normal e. Mirovî li ser van pirtûkan bixeble divê alfabea erebî baş za-nibe.

Di pirtûkên ku ji alfabe erebî vegerandine latînî xeletiyê pîr mezîn hene. Ji Mem û Zîn bigrin heta bi dîwana Melayê Cizîrî di gelek pirtûkan de em li van xeletiyân rastdibin. Ji ber çî? Ji ber ku ev metod, metodeki çewt e. Metoda rasî ku ev pirtûk di berçaviya akademiyekê an ji enstituyekê de weke xwe werne çapkirin. Wê demê wê gelek nivîskar karibin bi van pirtûkan re eleqedar bibin. Ev xeletî ji wê ji holê rabin. Edebiyata kurdî, wê li ser van lêkoşinan cihê esasî bigire. Riya edebiyateke nuh wê bi vî awayî vebe.

## Zimanê kurdî zimanekî bi zayend e

Kurdî zimanekî bi zayend e. Du zayendêñ wî hene. Zayenda nêr (eril, maskulin) û ya mî (dişil, feminin). Di dema destpêka fêrbûn û nivîsandina kurdî de, rastqisekirin û rastnivîsandina bêjeyêñ (kelimeyêñ) nêr û mî gelek zehmet e. Di kurdî de hemû navêñ yekhejmar ên (tekil) mirov, heywan û tişten nêr, zayenda nêr digirin. Zayenda nêr "ê" ye û bi paşıya nav ve tê nivîsandin. Hemû navêñ yekhejmar ên mirov, heywan û tişten mî ji, zayenda mî digirin. Zayenda mî "a" ye û ew ji, bi paşıya nav ve tê nivîsandin.

Ji bo zayenda nêr a yek-hejmar çend mînak: Bavê min hat. Temoyê Elî yek sa-li ye. Kûçikê min dijwar e. Xaniyê me gelek xwe e.

Ji bo zayenda mî ya yek-hejmar çend mînak: Diya min hat. evîna Elî şes sa-li ye. Çeleka min bi şîr e. Ma-la me gelek xwe e.

Di kurdî de hinek nav he-ne, ku zayenda wan nêtar (nôtr) in. Ev nav li gor nêr û mî têñ guhartin. Heger kes nêr be zayend "ê" ye û mî be ji "a" ye.

Ji bo zayenda nêr a yek-hejmar çend mînak: Hevalê min hat. Cîranê min çû Wanê, Mamosteyê min baş e.

Ji bo zayenda me ya yek-hejmar çend mînak: Hevala min hat. Cîranâ min çû Wanê. Mamosteya min baş e.

Di zimanê kurdî de ji bo hemû pirhejmaran (çoğul) zayendek heye: "êñ" e.

Ji bo hemû zayendeyen pirhejmar çend mînak: Xanîyê me bilind in. Bavêñ me jîr in. Kûçikêñ me dij-war in. Diyêñ me çûn reh-metê, çelekêñ me bi şîr in. Malêñ me xweş in. Hevalêñ me hatin. Cîranêñ me çûn Wanê. Mamosteyêñ min baş in.

## FERHENGOK

Ardû: tişte şewitandinê (yakıt)

Berxwarin: (tüketim)

Dil: êsîr, kole

Endam: aza (üye, organ)

Guftûgo: munâqşe (ta-tilşma)

Hêsan: rehet (kolay, basit)

Hol: Meydan

Derxistin holê: (ortaya çıkarmak)

Pend: nesîhet (ögüt)

Penddan: nesîhet kîrin

Pendname: wesiyetname, şîret

Rexnegir: rexnevan (eleştirmen)

Serwer: reis, serok, lider

Zanist: İlim

Zanistî: İlmi

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Ji bo xwendavanan  
Xwendevanen delal.  
Navnişan, telefon faxa  
me ya kevn hate guhertin. Navnişana hûh  
ev e.

Nurosmaniye Cad.  
Atay Apt. No: 5  
Kat: 1 D: 4  
Tel : 511 57 60  
511 66 02  
Fax: 511 51 57  
Çağaloğlu/Istanbul

Em dixwazin hûn na-me û nivîsen xwe ji vê  
navnişanê re bişînîn.  
Silav

## Azadî

Helbestek e azadî  
Ked e hozanê wê  
Di zimanê gerdûnê de  
Stranek e azadî  
Tevî kelepçeya li zendê  
Çikandina kulma çepê ye  
Ber bi ewran ve  
Weke tirşînek e  
Tevî cellad baskê wê ji bîbirre  
Mêzekirina kevokê ye  
Berejérin li gerdûnê, azadî  
Tevî cellad tembûrê perçê ji  
bike  
Dengvedankirina noteyan a  
hozan e  
Dîsa li gerdûnê  
Ü azadî xwîna sorîn e  
Weke lehiyê dide ber xwe  
Ü difetisîne çekçemêjokê  
Rumet Işıklı / Tetwan  
(Ez qizeke Kurd im  
û 10 salî me)

## Zelalkirina zimanê me Wêne guhêza Kurdan

Ma gelo kê bawerdikir ku wê rojek were kurdêñ di kûrahî û tariya dîrokê de mayî rabe xwedî li ronahiyek azad derkeve.

Dibe ku ev rasî ji bo hinekan xewn bû ji bo hinekan ji xeyal bû. Bi kurfî tu kesî bawerî bihatina van rojan nedianîn. Lî rasîtiyan wer li ber xwe da, ku bi diran bi goşt bi xwîn bi cangorî bi mîrxaşî bi egidî ewrê reş û tarî li ser ezmanê dayika me râkir, li aliyê din rûçikê dilgemar ên bê bîr û bawerî reşkir. Li hember astenga (zor) dagîkeran astengeke şoresserî hat afi-randin.

Dawiya berxwedanek bê rawestandin nîrxên hêja bi destê gelê me û me ve anîne.

Em Kurd bi salan li benda afirandina van nirxan bûn, em bi hesreta têr guhdarkirina lawik, stran, govend, ziman û hwd. giranbuhiyêñ neteweya xwe bûn. Em bi hesreta yekbûn, rabûn û yekîtiya xwe bûn. Ji bo vê zarokê medya li welatê bav û kalan cenga jînê dikin. Rojê bi dehan (10) livbazî-bûyer di-bin. Her bûyerek an ji livbaziyek êdî guhê siltanê kerr qu'l di-ke. Me Kurdan ji roj bi roj ber bi serkevtin û serxwebûnê ve dibe. Lewma ez dibêjim barkêş û zehmetkêş van bûyer û liv-baziyan, wêneguhêza me gelê Kurd rojnameya "Welat" e.

Bi rasî barê ku Welat hilgirtiye ne barekî sivik e. Barekî gi-ran, lê bi rûmet e. Em bi bawer in Welat wê bikaribe vî barî hilgire û bersivan bide. Ji ber ku di van çefniyan de mirov xwe dide iştatkirin. "Welat" li me û gelê me pîroz be.

Ji nivîskar û xebatkarê Welat re serkevtin û serfirazî dixwazim hemû pêñûs-hilgir ji bo Welat xwerapêçandin bike.

Seyidxan Şêradî

Bonn

## Li welatê xwe karbikin

Ez Newroza we (hinek de-reng be ji) û ya hemû Kurdan ji dil û can pîroz dikim. Ez karkerekî ji Qersê me, li ba-jarê İstenbol di karxaneyekî de dixebeitim. Edî ez zanim ku tu tiş qasî welatê mirov xweş nîne. Em li İstenbolê ji kê re dişixwilin. Gerek e em Kurd li welatê xwe karbikin.

Ev e deh sal in ez li vir ji dijminan re kar dikim. Lî belê, ji iro şûn de ez ê berê xwe bidime welatê xwe. Em Kurd gerek e edî ranewestin

(nesekinin), rawestina me bêxîretî ye. Divê em ji bo têkoşîna gelê Kurdistan bi-sixwilin.

Hey Welat em ji bo te nex-weşin iro.

Me dermanê nexweşîna xwe dîtiye

Dermanê me azadiya Kur-distan e

Me sond xwariye lo lo

Xwîna xwe em ê hilînîn

Xwîna şehîdan namîne li erde

Ez ji we gişan re spas di-kim karkeren Welat.

Orhanê Karker

Qers

## KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin  
aboneyê Rojnameya WELAT

Nav

:

Paşnav

:

Navnişan

:

Bedelê abonetiyê razînîn:

Li Tirkiyê : Y. Serhat Bucak İş Bankası Çağaloğlu  
Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Çağaloğlu  
Şub. Döviz tevdîat hesap No: 3113617  
Aboneyen hejâ,

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê  
razandina bedelê abonetiyê bişînîn. Navnişana  
WELAT Nurosmâniye Cad. Atay Apt.  
No:5 Kat:1 D.4  
Çağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 511 57 60-511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercen abonetiyê:

Li hundir

6 meh

60.000

12 meh

120.000

Li derive

30 DM

60 DM

Niwênerê PDK ê, yê Enqerê, Sefîr Dizaî:

## 'Rojnameyên Tirkîyê derewan dîkin'

Li Kurdistana Başûr berî çend rojan di nav gelê Kurd de ji bo Belediyê hilbijartînek hate çêkirin, di vê hilbijartinê de % 56 ê rayan KDP stand tu dibê wê di hilbijartîna 17'ê Gulanê de jî KDP serfiraz bibe?

- Belê kek, li Kurdistana Başûr tu hilbijartîne bi tevayîne hatîye çêkirin, lê berî demekê, bajarê ku di destê pêşmergan de bûn her partîyekê berdevkê xwe dane kifş kirin, di qomîta xwendevanan de % 80 ê bû, berdevkê Zaxo jî KDP ê stand, belê di nava gel de tiştekî wisa weke hilbijartîne çêbû, li gora texmînê wan digotin, ray %56 yên KDP ê ne, %30 yên YNK ne rayê din jî yên partiyen din in, hilbijartina tevayî emê di 17'ê Gulanê de pêk bînin, iro kîjan partî wê li pêş be ez nikarim tiştekî bibêjîm lewra hilbijartînek demokratik wê bibe, kotekiya tu partîyan li ser gel ne mimkun e.

**Li kîjan bajaran hêzên Berzanî xwirtin an jî kîjan di destê wî de ne?**

- Hewlîr, Behdînan- Zaxo, Dihok, Amedî, Akred %90 ev mintiqê KDP ê ne, berya demekê mintiqâ Silêmanî di destê YNK de bû, belê iro bi zahîf hêzê KDP lê xwirt in.

Rengê kartê partîyan ji bona hilbijartîne we çawa nîşan kirine?

- Rengê kartê KDP ê kesk e, yê YNK zer û rengê sor jî a Partiya Qomûnist e.

Ev hilbijartîn wê di bin riema neteweyen hevgirtî de were kirin, bona ci we ev pêwîst dît, qey derbasbûna dîroka Kurdistan nayete bîra we, we ci zû fen û fût ê Ingilistanê, Fransa, Şahîn şah û Amerika ji bîrakîn, sibehî ku hûn bixwazin Kurdistaneke serbixwe ava bikin ew ê ji were nebîne kelem, bê hesab gelê Kurd xwîn rijand, qey we hê xwe nasnekirîye her ku menfeeta Ewrûpî ya û hwd., ji Kurdan hebe wê mafê mirovatiyê, zilm û kotekiya ku li Kurdan tê kirin wê binine ziman, hêj doh Sedam pênc hezar Kurd qetîlîk 4500 gund hatin wêran kirin, cîma Ewrûpî, Tirk û Amerîka dengê xwe dernexistin?

- Belê, niha armanca me ne Kurdistaneke serbixwe ye, daxwaza me Kurdistaneke Otonomî ye, bilakis ku em alîkariyê ji welatîn Ewrûpî nestîn û ne li ber çavê wan hilbijartîn çêbibe wê pirsgirêk zehftir ji me re çêbîbin, em naxwazin ku Welatîn Ewrûpî bibêjin, gelê Kurd mîrkuj e, xwînrij e, ji çekê pêve tiştekî din nas naîke, loma em dixwazin ku Welatîn Ewrûpî tev werin ferca vê hilbijartîne, lewra ev hilbijartinek demokratik e. Iro gi-ring e ku mirov bala xwe bide

"Bona ku mirov serfiraz be, ramyarî pêwîst e. Çek û Aborî zehf girîng e, hînek ev 30 sale ku pêşmerge ne, reşît in, gernas in, fêris in lê bi konevaniyê qet nizanîn. Belê rast e mirov iro şerê Kurdistana Başûr û Bakûr nikare bike wek hev. Ku ev pêşketin û serhildan nehatiba kirin ez û te li paytexte Tirkîyê me nikaribû li ser pirsgirêka Kurdan mijûl bin."

cîhanê, hûn dibînin Sovyet peşkilî, di hêlekê de Dewletîn Ewrûpî, di hêla din de jî Dewleta Amerîkî xwedî hêz ma ye. Ji demek dirêj de em şer dîkin, bi şer tenê tiştek nayete safikirin bi şer re konevanî ji pêwîst e, em iro dixwazin bi aşti bîghêne armanca xwe, belê rast e iro li ser Kurdan qontrola Ewrûpî û Amerîkî heye, lê ev qontrol ne li ser Kurdan tenê heye, li ser rojhilata navîn tevî ye, têkiliye wan bi Urdîn, İsrâîl, Siûdî, Tirkî û hwd, re heye, lewra ku menfeetî wan ji hevdû hene, Kurd û nikarin qontrola Ewrûpî û Amerîkî bi qetînen, heke ku ne ji Ewrûpî û Amerîkî bûya, wê Sedam cardin êrîşen xwe le me bikira, lewra wan iro baskê Sedam di berde jêkirine û naxwazin ku Dewletek Şii an jî qomunîst were damezirandin. Iro du ebloqe li ser me heye, yek ê Neteweyen Hevgirtî ku li ser Iraçye, di hêla din de jî a Iraçye li ser me ye.

Di şerê Korfezê de hêzên Sedam şikestin, tevlî dused hezar cehş di nav pêşmergan de cih standin, di hundîrê 15 rojan de axa Kurdistan bi tevayî xistine destê xwe, lê ev dom nekir. Di roja 16 an de ji warê xwe mihamîr bûn, reben û perişan bûn, lewra tê xwiyakîrin ku tu rîxistin di nava pêşmergan de tune ye, konevanî tune, tevger û têkiliye siyasi tune, anî em karin ji serhildana Qadî Muhammed bigrin heyanî Mele Mistefa Berzanî serhildanek pûc hejar û bê rîxistin e. Belê gelê Kurd zehf bi cerset e, zehf şervan e lê ev tenê ne bes e ji serxwebûn û serfirazî ye re. Jibo azadî gelê rîzan pêwîst e, Serokê bi bîr û bawer, bi konevanî zana ê ku karibe cîhanê di şerê xwe de bizivirîne, cîhanê tahlîl bîke, piştî ewqas serhildanen hêjî pêşmerge di çiya de dijîn, xwarina wan berwê dara, razana wan li ser tahta, vexwarina wan jî ji ava hewda ye, anî qet jiyan ji wan re tune ye, lewra ez dibêm evaya gunehê Serokê we ye, serhildanê wan giş têne şikanîn, şerpeze û reben dibin, ev heyanî kîngê wê wisa dom bîke, rewş guhertin pêwîst e anî ev şikandina serkeftina we, ne jî tanq, top û şirokên Sedam e, va ye şerê Kurdis-

tana Tirkîyê jî li ber çava ye, Artêşa Tirk bi tevî çekên xwe yê giran êrîşen xwe dibe ser PKK ê, lê nayê şikanîn, ev ci ye, ev yekîti, tifaqî, bir û baweriye, tanq û top bîr û bawerî ya gel nikare bide sekinandin, yekî pêşmerge kare çekê xwe bide bi telisek ard, şoreşa we heke bi vî renge be ji xwe wê bifetise û hilweise ji bona van pirsan hûn ci dibêjin?

- Belê kek, ev gotinê we rast in, dirûstîn, rîxistin bi ramyarî pêwîst e, ji bo yekîti û serfirazîya gelê Kurd ev girîng e, şerê çekdarî Ji bo azadî ya gelê Kurd pêwîst e ku hebe, belê a niha parastina gel di hêla diplomasî û konevaniyê de jî girîng e. Di sala 1961 û de şoreşek mezin e, ev konevanî ji însaneti û mafêni mirovahiyê gelel dûr e. Em loma dibîn, hey Çakmur û Sarışın kanî hûn dost û mirovîn karkeran bûn, hûn fedî nakin ji van fen û durûtiyê xwe, belê rast e hûn fedî nakin, lewra heya li rûwê we nema ye, di rojekê de cil carî li sozê xwe diqulupin weke gotina pêş û binê dibîn "Çille ye û cil hawye. Partiyen dewlemendant tev wisan in, fikra wan û gotina wan ne yek e, li ser pişta karkeran di kursî û meqaman de rûdinin.

Lê bila Çakmur û Sarışın wisa rind zanîbin, gel nema ê berê ye ku bi benîşt û şekirekî were xapandin. Iro gel bi tifaq, hevgirtî û bi rîxistin e, nema karin bi şerê wan bileyiz. Gel edî zane wê bi ci awahî bersiva yêne weke Çakmur û Sarışın û hwd. bide.

wan de çenebûye em bi hêvî dikin, Kurden Tirkîyê Iraq, ne ku ji vir û wê de jî çenebe. Belê iro dema ku PKK tixûbê me derbasîke û êrîşen xwe di be rawesfîngehê Artêşa Tirk, pişt re Dewleta Tirk êrîşen xwe tîne gundîn pêşmergan, di êrîşen Tirkan de heyanî iro tilî ya yek pêşmerge PKK bi xwîn nebû ye, yê ku têne kuştin Kurden Kurdistanâ Başûr in, em naxwazin ku ev livbazî ji bo me bêne kirin.

Qey hûn ji Dewleta Tirk re nabîn, we yekî PKK ê nekuştî ye bi van êrîşen xwe, bombebaran ê we tev li ser me dibare, qey hûn dengê xwe nakin?

- Berya demekê me şirovekirine amade kir, me go ku Dewleta Tirk van êrîşen xwe bidomîne, emê eleqat û têkili yêne bibirin, belê ji bo ku ev êrîşen Dewleta Tirk were sekinandin, destpêkanîne me çedîbin.

Dema ku Berzanî hate Tirkîyê ji bo PKK ê tu peyman ê we çêbûn an na. Dewleta Tirk ev peymana hanê di TV, radyo û rojnamên xwe de jî anî ziman?

- Tu peymanek bi vî rengî nehatiye kirin, tev derew in, rojnameyên Tirkan derewan

nûçeyên welêt



Ali Yigit (Parlementerê Mêrdînê)

## KONEVANIYA NUH

Belediye reisê Izmirê sozê ku ji xebatkar û karkeren Kurd û Tirk re dan neanîne cih. Tu dibê qey Belediye Reisê Izmirê nuh bi şînkirina bajîr hisiya ye, tu dibê qey ev çend roj û meh in Belediye li Izmirê hatiye damezirandin. Belê heyanî doh jî, dema ku di hilbijartîne de bû, Çakmur û Sarışın ji karkeren Tirk û Kurd re digotin "hûn taca serê me-ne", digotin "em soz didin we karkestan tev, emê we bikin xwedî kar û xebat, em desten we li ber rûkîn we nahêlin, em tu carî qırka we tahl nakin, em ê heq û mafêni we bidin we."

Belê iro di karwanî (pratîk) yê de Belediye Reisê Izmirê nebû xwediye yek gotinek xwe û sozên wan tev vala derketin. Heyanî doh ku digotin "Sêniyên Midya taca serê me-ne", vêca iro li sîka-ka bi pihîna Sêniyên Midya didine ber hev û di bin lingê xwe de diperçiqin. Di hêla din de teblê ku karker ji xwe re li ser tîstan difroşin, dibê ezê cihê wan bikim çam û çîmen, ezê bikim meyda-na şînkayê, bi vêna tenê jî nasekine, dibê ezê dest deynime ser tebla û bifroşim li meydana şînkayê mesref bikim.

Belê, ên ku vî karî dikin li bajarê Izmir tev mirovîn Kurd in. Belediye bajarê Izmirê ku bi pirrayî karkeren gelê Kurd lê dijîn, bi vê durûtiyê ji bo ku ev karker dest teng, bêkar, bê xebat û bêmecal bimînin wisa dikin.

Ji xwe ji neçarî ev gel ji welatê xwe derketiye, berê xwe daye Edenê, Mêrsinê û Izmirê. Ev konevaniyeke nuh a dewletê ye. Li metropolê jî dixwazin gelê Kurd bê kar û şîxul bikin. Ev neyartike zehf mezin e, ev konevanî ji însaneti û mafêni mirovahiyê gelel dûr e. Em loma dibîn, hey Çakmur û Sarışın kanî hûn dost û mirovîn karkeran bûn, hûn fedî nakin ji van fen û durûtiyê xwe, belê rast e hûn fedî nakin, lewra heya li rûwê we nema ye, di rojekê de cil carî li sozê xwe diqulupin weke gotina pêş û binê dibîn "Çille ye û cil hawye. Partiyen dewlemendant tev wisan in, fikra wan û gotina wan ne yek e, li ser pişta karkeran di kursî û meqaman de rûdinin.

Lê bila Çakmur û Sarışın wisa rind zanîbin, gel nema ê berê ye ku bi benîşt û şekirekî were xapandin. Iro gel bi tifaq, hevgirtî û bi rîxistin e, nema karin bi şerê wan bileyiz. Gel edî zane wê bi ci awahî bersiva yêne weke Çakmur û Sarışın û hwd. bide.

Kîjan partîyan qerar da ji bo ku PKK ji Kurdistanâ Başûr derê?

- Partiyen ku di Cephê de cih distînîn.

Berzanî ji bo ci heyanî iro nehatiye Tirkîyê, ji bo ci ev gest pêwîst dît?

- Berya salekê Dewleta Tirk ji bo Berzanî bangnamek şan-dibû, lê Berzanî nehat, dema ku Dewleta Tirk navnîşa gelê Kurd da nasîn, Berzanî bi vê yekê şannaz bû û hate Tirkîyê.

Geşta Berzanî a Ingilistan, Fransa û Amerîka ji bo hilbijartîne jî Petrolê dibe?

- Tiştekî wisa nîne û nehatiye kirin, tu peyman li ser petrolê nehatiye kirin, Ewrûpayîn xwestin ku dîtin û ramana Berzanî binasîn û ji siyaseta wî serwext bibin, li ser hilbijartîne dîtin û ramanen xwe ji bo demokrasî û mafêni Kurd şirovekirin.

Heppevîn: S. Arjen

# Her aliyê welatê me Bekaa ye



Hafiz Esad

**Hêvi Can**

Çapemeniya Tirk û rîvebirên dewletê, çend meh in ku li ser çûna İsmet Sezgin a Suriyeyê radiwestin. Dewlet girîngiye ke mezin dida vê çûne. Rîvebirên dewletê û çapemeniya Tirk, bi eßkere Suriyeyê tehdît dikirin. Suriye diviyabû xwestekên Tirkîyeyê bi cih baniya "Eger Suriye xwestekên Tirkîyê bi cih bîne wê demê dawiya PKK ê jî tê" digotin rîvebirên dewletê. Belê serlîdana İsmet Sezgin, girîngiye têkoşîna rizgariya netewaya Kurd û gehînuka ku gihiyyê derdixe holê.

Dewleta Tirk, ji aliyek ve gef dide (tehdît) dewletên hemşînorêñ xwe û ji aliyek ve jî, ji bo fetisandina têkoşîna rizgariya netewaya Kurd, ji dinyayê alîkarî dixwaze. Niha siyaseta dewletê ya li hemberî gelê Kurd ev e: "Têkiliyên wî ji her aliyê ve qut bike, çarmedorâ wî bigre û biperçiqîne." Dewleta Tirk vê siyasetê li hemberî serîhîdanêñ Kurd ên kevin dikariya pêkbaniya. Gelô iro jî di vê pirsê de dikare bi ser bikeve?

Gelo Suriye wê bikaribe li gor xwestekên Tirkîyeyê bilîve? Bi pirseke din dewleta Tirk, dikare PKK ê biperçiqîne? Dema mirov rewşa herêmê û ya dinyayê, hêza Kurdan û ya PKK ê, siyaseta Suriyeyê bas nizanibe, mirov dikare bibêje ku Suriye li ba Tirkîyeyê cih girt

Kurdan û ya PKK ê, siyaseta Suriyeyê bas nizanibe, mirov dikare bibêje ku Suriye li ba Tirkîyeyê cih girt.

Dewlet, ji bo ku xwe ji dijiminêñ xwe bikaribin biparêzin û di nav netewayan de ciheke girîng bigrin, xwirtbûna wan a hundir bi tenê ne bes e. Girîngiye pêwendiyêñ diplomatik

ên li derive gellek mezin e. Dewlet ji ber vê yekê çalakiyên diplomatik dimeşîmin. Tu dewlet nikare xwe ji vê têkiliyê bê par bihêle.

Cih û rûmeta dewletekî ya di nav netewayan de, li gora hêza wê ye. Anku dewletek cîqas bi hêz be, rûmeta wê jî li derive hewqas zêde ye. Dewlet

ku hêza xwe ji gelê xwe negre û nikaribe siyaseteke serbixwe bimeşîne, dibe pêykerê dewletê din. Di herêmekê de, dema girîngiye erdnigariya wela-tekî zêdebe, wê gavê girîngiye vê dewletê jî mezin dibe. Rewş û mijara PKK û Suriyeyê jî divê ku li gor siyaseta dinyayê ya îroyîn bê nirxan-din.

PKK her demê baweriya xwe bi hêza xwe anîye, pêwendiyêñ xwe yên li derive jî li gor vê dimeşîne û têkiliyêñ xwe yên hevkarî û piştgirî jî, li gor vê prensibê dimeşîne. PKK dema qada Suriye û Libnanê bikaraniye, hêza xwe baş nirxandiye û xwe bi Suriyeyê ve tu dem girînedaye. Têkiliyêñ ku di navbera Suriye û PKK ê de henin, li gor berjewendêñ her du aliya nin.

Dewleta Tirk, heta niha gel-


lek caran ji bo fetisandina PKK ê xwest ku bi Suriyeyê re li hev bê, ji ber vê yekê jî, di navbera Tirkîyeyê û Suriyeyê de çend peyman hatin ûmzikerin. Lê Tirkîyeyê heta niha ji van têkiliyan tu fêde negirt. Tirkîyey, gellek caran Suriyeyê tehdît kir, lê ev jî bê encam man. Dema, hêz û giraniya PKK ê ya li herêmê neyê zanîn, mirov nikare bersîva van pirsan rast bide.

PKK, rêxistîneke teng nîne, hebûna wê jî, tenê bi çend liv-baziyan ve mirov nikare girîbide. Bi milyonan alîgirêñ wê yên ji dil henin. Gelê Kurd PKK ê ji xwe re pêşeng dihesibîne û lê xwedî derdikeve. Ji ber vê yekê Suriye, naxwaze ku sîh (30) milyon gelê Kurd ji xwe re bike neyar. Suriye giraniya Partiya Karkeran li Rojhilata Navîn baş dizane, ji lew-re, nikare dijmintiya wê bike. Dijmîntiya PKK ê, kîrî Suriyeyê nayê. Ji ber vê yekê Suriye li gor xwestekên Tirkîyeyê nalive.

İsmet Sezgin, di vegera xwe ya Suriyeyê de, digot ku derbeyeke mezin li PKK ê xisti-ne, rojnamevan Cengiz Çandar jî di vê baweriye de bû. Suriye heta niha tu alîkariyê nedaye PKK ê, lê ji hinek tiştan re çavêñ xwe digirt. Ev helwesta (tavîr) Suriyeyê, ji PKK ê re riya hin derfetan (gengaz, im-kan) vedikir. Wisa tê xwiyan ku Suriye weke berê nikare bi-ke, wê riya hin gengazan big-re. Wateya vê jî, ji bo PKK ê ewqas mezin nîne. Suriye, iro naxwaze ku bi Tirkîyeyê re bi-keve cengê. Ji ber vê yekê jî Suriye diviyabû ku hin tawîzan bida. Rewş Suriyeyê ya aborî û siyâsî ber bi nexweşîye ve diçe. Hikûmeta Suriyeyê, dixwaze ku jê re çare bîbîne. Amerîka û Franse li ser xwestîna Tirkîyeyê, ji Suriyeyê re mesaj rîkirin û xwestin ku bi Tirkîyeyê re li hev bê. Belê ji ber van sedeman belkî mirov dikare bibêje siyaseta Suriyeyê diguhure. Lê Suriye li hemberî PKK ê neyartî nake.

Di Rojhilata Navîn de cihekî Kurdish ê girîng heye. Suriye bixwaze jî nikare PKK ê hîilde hemberî xwe. Ji lewre hewcedariya Suriyeyê bi PKK ê heye. Giraniya PKK ê ne tenê di Rojhilata Navîn de, lê her wiha di dîplomasiya din-yayê de jî heye.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku PKK, qada Suriyeyê û Bekaayê weke berê ji hêla artêşî ve wê nikaribe bikarbîne. Ji xwe hewcedariya PKK ê jî edî weke berê bi van qadan re nîne. Ji lewre ew li her aliyê Kurdistanê gellek xwes bi cih bûye. Bargehêñ ARGK ê jî, li Kurdistanê ne. Ji ber vê yekê em dibêjin ku her deveren weletê me Bekaa ye.



PKK li her aliyê Kurdistanê gellek xwes bi cih bûye. Bargehêñ ARGK ê jî, li Kurdistanê ne. Ji ber vê yekê em dibêjin ku her deveren weletê me Bekaa ye.

## GOTİN

Yaşar Kaya



### Ka li ku derê ne?

**D**i sala 1959 an de, li unîversîta ïstenbolê gelek hevalan digotin "Em Kurd in." Wî çaxî ev gotin mîranî û mîrxasî bû, di dawiya wî de 49 kes hatin girtin. Em sal û nîvek şûnde derketin, dîsa dageriyan zanîngehêñ xwe. Xwendeyên Kurd roj bi roj zêde dibûn.

İro ez û gelek hevalan ku dizivirin li pişt xwe dinêrin, ji 30-35 salî zêdetir derbas bûye. Ew xorîn Kurd yêñ ku li ïstenbolê xwendin em hevdu rind nasdikin. Hinek

dageriyan çûne welatê xwe, bûne avûqat, bûne mebûs, hinek zewicîn li ïstenbolê man, bûne koşîdarên jînepîran, hinek di varoşen ïstenbolê de riziyan û winda bûn. Hinek armanca wan mebûstî bû, ji bo wî ji gelê Kurd re digotin em Kurd in, wekî din tu xireta wan tunebû. Di nav vî 30 salî de gelek ji wan, ji partiyêñ bajarvaniyan bûne mebûs, me meşandina wan dît, ji tîrsa xwe nikaribûn bêjîn em Kurd in, ji dema hilbijartînê heyâ hilbijartînê diçûne Kurdistanê. 30-40 sal li ser xwîna me, li ser ke-دا milê me "seltenet" ajotin. Lê belê iro Kurdistan ne Kurdistanâ berê ye, Kurd ne Kurdên berê ne. İro ji destê me tê, em ê yek bi yek wan derxin ber çavê gelê Kurd.

Hinek heval zivirin çûne Kurdistanê, di 12 Adarê (12 Mart) de, di 12 İlône (12 Eylül) de kî kete qela Diyarbekirê, kî kete zindanan. Ü kî li wan xwedî derket. De-

ma ku bêkesen Kurd diçûne ber deren-hin ji van avûqatan, digotin: "Welle apo qisûrê nenêre, ez li dozen (dewe) siyasi-nanêrim." Em wan jî nasdikin. Ev kes iro li ïstenbolê radibin bi Murat Belge re dibi-ne xwediye doza Kurd û Kurdistanê. Me serê xwe dananiye erde.

Mîna diz û piza li kuçen tarî digerin, li tu meydânî tune ne. Gelê Kurd radibe partiyeke mîna HEP ê avadike, ew direvin, Enstituya Kurdî tê damezirandin ew tune ne, Fondation (weqfa) çanda Kurdî çedîbe ew dîsa tune ne, ji her tiştî direvin. Mînanî teyrê sîmir hewya cendeka nin, ew ê sibê bibine xwînmîjîn Kurdistanê.

Em 40 mirov in, em hevdu rind nasdikin. Evana ne li şayiyê û ne jî li şînê he-ne. Berbang nêzîke, cihê me, riya me, rîça me kîfî e. Ka? lê evana li ku derê ne?

# Ji bo azadî û rizgariyê, du milyon Tirk û milyonek Kurd bes in!

M. Ali Tüysüz

Bi şoreşa Fransa re (1789) gelên Ewrûpa dest bi damezrandina dewletên xwe yên neteweyî yê nûjen (modern) kîrin. Neteweyê Ewrûpa, bi piranî di salên navbera 1800-1900 an de bingehêne dewletên xwe yên irohî (rojê) danîn. Di wan salan de, bi taybetî, di destpêka 1790'an de, di bin serokatiya General Napolion Bonapart de, îşxal, îstila û dagîrkîrina Ewrûpa û bakûrê Efrîqê, yek ji sedemê çebûn û wergirtina hisen neteweyî bû. Îstila û îşxal, di 1804'an de bi xwe qral İrankirina Napolion nesekinî û heta windakirina serê Waterloo/Belçiqâ (1815) domkir. Li Ewrûpa, gelên ku welatên wan hatibû dagîrkirin ji bo ku xwe azad û xelas kin, mecbûrê ro-nesansê (ronikirina Volter û Rousso) bûn. Ew bir û baweriyen ronikirinê, ji bo azadbûna neteweyan bû bingeh. Prensiba "ji bo her neteweyî dewletek" dihate parastin. Ew prensib bû sedema serifakirina neteweyan li Balqan, Rûsyâ, Habsburg, Skandinavan û hwd.

Bi şoreşa Oktobr (1917-Sovyet) û dû re jî Çin (1949) re li ber şoreşen sosyalist û Şo-reşen Demokratik yê gel vebû. Ji bo gelên kolonî li Asya û Afriqe, bû salên avakirina dewletên neteweyî û azadiya wan ji kolonyalîstan.

*Ji bo serkeftinê, ji bo azadî û rizgariya gelê Kurd û Tirk, rabûna du milyon Tirk û milyonek Kurd têr dike. Ew çend milyon, him ji bo xistina îqtidarê û him jî ji bo sistem guhertinê bes e. Yek şert çend roj li hember dijmin rawestin, hevkarî û berxwedan e. Ew prensiba "ji bo her neteweyî dewletek" wek di van salên dawî de xwiyakir prensibek bi heq e û ew iro jî derbas dibe*



Kurd, ji bo biratî û wekheviyê dimeşin

yê Gel dihatin nasandin, avabûn. Wek tê zanîn, di navbera salên 1960 û 1980'an de jî, ji bo gelên kolonî li Asya û Afriqe, bû salên avakirina dewletên neteweyî û azadiya wan ji kolonyalîstan.

Di wan şerên ku di dused

salên dawî de bûne, bi milyonnan mirov hatinê kuştin. Gelek şer di nav, an jî di navbera eyni sistemân de bûne. Lî, şerên ku di navbera hêzên cûda di nav eyni sistemê de yan jî di nav dewletek de bi armanca sistem guhertinê bûne, di van sedsalên

dawî de gelek in. Hinek ji van, di navbera sistemâ rûniştî, yanê îqtidar û muxalefetê de çê bûne. Wek nimûne, mirov di-kare behsa bûyerên ku di van çar-pênc salên dawî de li Sovyet û dewletên din yên reel-sosyalist de bûne û sistem guhertine, bike. Ji bo guhertina van sistemân ne şer di navbera çin û refan de bû, ne jî pîr xwîn herikî. Sedemê ku şerê mezin li vêderê derneketin di-kare ji, ber bi kapitalizmê gav avêtinê ve giredayî be. Lî sedema bingehîn ya raya giştî ye.

Ji bo vê yekê, di çarçova edalet û di nav sînorê heq û hiqûq de, ji ber kîjan sistemân ideolojîk dibe bira bibe - parastina sistemân faşîst, an jî şer ji bo avakirina dewlet û sistemân wek Hitler diparast ne tê de-guhertinê ku van çend salên dawî de li cihanê bûne, mimkûn nake ku şoreşen di pêşerojê de bibin, bi xwe re xwîn rijandineke hov bînin. Ji ber ku raya giştî yê li cihanê ji bo mafê mirovatîyê çebûyê, dê çavê xwe ji qetîaman re negre û jê re musade neke. Ji bo vê jî mirov dike bibêje ku heger gelên bindest xwe ji bo şerê azadiyê û serkevtinê amade bîkin û çînên ku di sistemân kapitalist de perşanîn, xwe baş organîze bîkin û li dij kedxwarî derên, dê tu qewet nikaribe pêşiyê li wan bigre.

Heger em li vir rewşa gelê Kurd û Tirk di vê çarçovê de şî-rove bikin, pêwîst e çend gotin di vî warî de bêtin gotin; Kar-ker û zehmetkêşen Tirk, di dîroka xwe de, bi rîexistin û sendîkayen xwe, qet nikaribûne bîbin talûke û sistem û mekanîzma dewleta Tirk yê kedxwar tu car tehdît nekirine. Di dîroka komara Tirkiyê de grevîn gelemerî û protestoyen ku mîlyonan derdixin meydan û sika-kan tunene. Dîsa pêwîst e em vegerin ser bûyerên Rojhilat Ewrûpa û Sovyet. Heger were bîra me, Honeckerê Almanya Rojhilat, Çawîşesko yê Romanî yê û herwiha li hemû van dewletên reel-sosyalist, bi derketina derve û protestoyen çend-deh hezaran, serok û mirovîn wan dev ji her tişti berdan û reviyan. Mengîstu yê Habeşistanê xwe li ber çend hezar gerillayan negirt û reviya. Ev nimûne gelek in. Îqtidarîn xerab ne mumkun e li hember rabûna çend sed hezaran li ser linga bisekinin.

Ji bo vê yekê, ji bo serkeftinê, ji bo azadî û rizgariya gelê Kurd û Tirk, rabûna du milyon Tirk û milyonek Kurd têr dike. Ew çend milyon, him ji bo xistina îqtidarê û him jî ji bo sistem guhertinê bes e. Yek şert çend roj li hember dijmin rawestin, hevkarî û berxwedan e. Ew prensiba "ji bo her neteweyî dewletek" wek di yan salên dawî de xwiyakir prensibek bi

ketiye û şerê we yê keçel jî ev cara heftan e em dibînin. Lewle-bazî û zimandirêjî we xelas na-ke, berdin gotinê mîna demokratî, edalet û qanûnê, qanûna rovî û çeqelan jî, ji qanûnên we qanûnîstir in. Hûn li kur in û Ewrûpa li kur e? Demokratiya we hîna xwe negihandiye bejna demokratiya Bastîl ê jî. De herin bîqestin, hespîn we birçî bûne, bi hevre ceh û kayê bixwin heta hûn pê bimrin.

Ez ecêb dimînim eger axurên we ewqasî navendîn demokratîyê ne, wê çaxê, çima H. Kozaççioğlu ne peya, newîre bi erebê jî bigere, tenê bi Heliçop-teran dike bajêr kontroi bike.

Gelo wê ci bibe eger ew bêhnekê ji xwe re li bazarê bigere. Herhal işe wî pîr zor e, xwedî jî wî xelas nake.

Dogân (efendi) her roj zirtan dike, dibêje "emê wan qet qet bîkin û ji holê rakin". De baş e zir-to eger wiha ye çîma kure te ji ber eskeriyê reviya çû Almanya? Eyb e, ji kerema xwe wî vegerîne û bila tevlî "Mehmetçikîn qehremân" here Şîrnexê.

Ho koalisyonâ rizî, hûn ji Newrozê û heta niha têra xwe rezil bûne. Di nava vê mehê de hûn 20 salan ji Ewrûpa dûr ketîne. Ez nabêjim eman heqên me bidin, edî emê heqên we bidin we.

## Komela Jinên Welatparêz vebû venebû hate girtin

Komela Jinên Welatparêz roja 2'ê Gulanê şubeyek li Kadıköy ve-kir. Lî pîşti 3 rojên din Navenda Komelê ji teref hêzê dewletê ve hate girtin.

Di vebûna vê şûbeyê de endamê rûmetî yê jînên welatparêz, diya Cafer Demirel ji amade bû. Diya Cafer bi endamên YKD re hînek sohbet kir. Di sohbeta xwe de bîr û baweriya xwe li ser têkoşîna neteweyî ji endamên komelê re wiha anî ziman "Riya Cafer tê de dimeşîya vala nehîlin, heta serkevtinê ranewestin (nesekinîn). Ez bi kurê xwe Cafer serbilind im. Ew lehengekî mezin bû. Ji ber ku ew di riya doza welêt de meşîya û bi hemû bîr û baweriya xwe, ketibû vê riya bi rûmet. Hûn jî di riya wî de bimeşin. Ez bi we bawer im."

Pîşti vebûna şubeyka YKD ya Kadıköy, hêzên dewletê girtin ser navenda YKD û, li arşîva YKD û gerîyan û wêneyen serhîdan û gerillayan wek mazeret nîşandan û bi vê mazeretê faaliyeten wê qedexe kirin û YKD û girtin.

YKD, ji ber vê yekê, dawxiyaniyek çapemeniyê çêkir. Di dax-wiyaniyâ xwe de ev helwest (tevr) a dewletê ya anti-demokratik protesto kirin û bala hemû saziyên demokratik û raya giştî kişandin ser van kirinên anti-demokratik ên dewletê.

Roya 5'ê Gulanê hêzên dewletê, ji xeynî YKD, DEMKAD, DKD, ÖZGÜR-DER HKD û BEMSEN jî girtin, faaliyeten wan qedexe kirin.

## Keça deryayan "Helsinki" û çend gotin

R. Cizre

Hejmara hemwelatiyê Finlanda 4.8 milyon e. Gelê Finlanda bi taybetî û karakterên xwe ve neferekî wê malbatê ye ku gelên Macaristan Lîtvanya û Estaniya di nava xwe de kom dike. Finlanda heta sala 1944 an hîna ji nuh ve gîhiştiye serxwebûna xwe. Ji bîr nekin, ezê hîna gelek tiştan bêjim, Finlanda berî Komara Mehabadê tenê bi du salan ji nîrê dagîrkeriyê rizgar bûye belê bi rastî herkes nikare vê ras-tiyê qebûl bike, ku di nava van 48 salan de gelê Finlanda gelek standartên jiyanê li Ewrûpa di bin xwe re hiştine, li Mehabada me jî hîna 48 mirov bi hev re nîkarin di nexweşxaneyekê de razên.

Firehiya axa Finlanda 337.000 Km<sup>2</sup> ye. Ü jimara golên wê jî 60 hezar e. Ekonomiya we-lat pişta xwe dide jêkirina daris-tanû û çêkirina her cure kaxetan. Di avakirina gemiyên weke dewan de jî di nava çend we-latên pêşin de cihê xwe digre. Paytexta Finlanda Keça Deryayan "Helsinki" ye. Helsinki ji sa-la 1812 an ve bûye paytext, bi jimara xelkê xwe nîv milyon e û bi sîmaya xwe jî weke mûzeyek di hewayê vekirî de ye. Gorepan (meydan) ên bajêr seranser bi heykelên mirovîn xweşnas (meşhur) xemilandine. Avahîyen mezin û stûnên klasik yên

bi nexşê û tacên kevnare, nîşana hebûna medeniyeteke dirêj e. Gipse qereçiyê Finlanda ne, jimara wan jî pênc hezar mirov in. Lap jî kêmâniyeke neteweyî ne ku, di sêgoşeya tixûbêن Rusya, Finlanda û Norwêcê de dijin, jimara wan jî li Finlanda tenê 2500 e. Ev herdu kêmâniye neteweyî xwediyê hemû mafê xwe yên şexsi û neteweyî ne. Çand û zimanê xwe bi azadî pêş dixin û di hemû dibistanên Finlanda de, dikarin du saetan bi zimanê dayîka xwe bixwînîn. Ne tenê ev, lê jî me re gotin, dema mirovekî Gipse bikeve zindanê mafê wî heye ku mamostayekî taybetî were bi zimanê wî, wî hîn bike.

Dema Mîrya hevalekî ji Kur-distana Başûr ji min re behsa vê pîrsê dikir, di serê min de Şîr-nex, Cizîra Botan û Nîsîbîn diçûn û dihatin, di dilê xwe de jî min got: "Maşallah! Ev çîqasî dewleta 12'ê İlônê, dewleta MGK û Doğan (efendi) ji Kur-dan re baş e".

Jînara Swêdiyan li Finlanda %8 e. Belê, di hemû dibistanan û saziyên dewletê de, zimanê Swedi, zimanê fermî (resmi) yên duyemîn e. Ji bo ji %8 mirovîn Swêdi jî rojname, kovar, radyo û kanalên TV û jî hene. Li ser hemû xaka Finlanda jî, li her cihêku gotinekî Finî tê nîvîsan-din di bin re jî, ew gotin bi zimanê Swêdi tê nîvîsandin. Li

Finlanda di bin gotina (Taksite) re dinivîsin (Taxi) û di bin gotina (Helsinki) re jî dinivîsin Helsingforş. Li gora vê pîvanê jî, eger em kîliyekî bi henekî bêjîn "De baş e Tirkîye perce nabe"-wê çaxê jî divê berî ku mirov bîghêye paytexta Tirkîye bi tirkî binivise Ankara û di bin re jî bi kurdi binivise Enqere, nexusim eger em bizanibin ku jimara Kurdan li gora jimara Tirkîye iroyîn %26 bêhtir e.

Li Finlanda eger pêwîstî he-be, her mirovek dikare here sera-ya parlamentojê û derdê xwe ji niwîneren gel re bêje. Serokwe-zîr jî li gora kîfa xwe bi tenê di-gere, bi tenê diçe bûroya xwe û bi tenê diçe bazarê, turîkên naylon tije xwarin û vexwarin dike û vedigere.

De ka em vegerin welatê koa-lîsiyona Silêman û Erdal. Hey zarên Moxol, Timorleng û Cen-gîzzanan, min hînekî methê Finlanda kir, belê ez dizanim çi dibêjim. Hebûna we şerma dîrokê ye. Derbas bûye, ew dema we destê xwe bi serê Kurdan re dibir û digot "Xwedê van Kur-dan ji mere bihêle, çi xulamên bas û durist in". Kurd, êdî vaye ji heqê we derdi Kevin û bê gu-man e ku wê heyfa bav û ba-pîren xwe ji we bigrin.

Ev çawa dibe, ji bo saetek TV hûn qiyametê radikin. Wellah em bi deh kanalan jî razî nabin. Na xêr kumê we ji zû ve bi bayê

# Welatê şarî di 1'ê Gulani

J. Espar

Gelê karker û kedkarê Kurdistana, wa roşanê şima hemînî pîroz (imbarken) bo! Mela şima Kurdistana azadi di hinzar roşananê anasarênan (winasîn) veynî!

Ez nîwazena tarîxdê 1'ê Gulani reyra serey şima bidejno (bitewno). Zordarey û gonîweley Dewleta Tirk zî ha çiman ver dir a. Şima ma ra rindê û weşer veynenî ki hergû roj na Dewleta bêbavi se kena.

Ewro heme cadê Dîna di roşan o. Roşanê karker û rencberan o. Karker û rencberê Dîna pêrû kuçan û meydanan dir i. Dîna yewna roşano ona (winî) ìnternasyonal çînî yo. Aw semed ra ma zî qayîf ewro şima ri, qalê pîrozkerdiş 1'ê Gulana Stokholmê biki.

Kurdê Stokholmi hezey hergû serri, emsar zî 1'ê Gulani Partiya Çep reyra pîroz kenî. Partiya Çep, Partiya Komünîstiya veren a. Yew deme re ver, na partî zî hezey gelek partîyanê komunistanê bînan, kelîma komunîsti namedê xwi ra veti. Partiya Çep vijinayışê (seçimî) umûmî di sedi 4-5 ray gêna û parlemento di wahîre 15 parlamentean a. Nê serandê peyenan di çend ray mesela Kurdan parlementoya Swedi di munaqeşe kerda.

Rayê mi virî yeno, 1'ê Gulani di vewri varay. Labelê ewro eyam weş o. Tinca zaf hadi çînî ya labelê serd nîyo. Ma hemma Metroya Mariatorget ra vejêni- nevejêni, şar belavokanê (bildirîyanê) xwi dano medest. Embazî henekî kenî vanî

"ganî kî nê belevokan ser o yew tewre xwi di biçarnî" Kam belavoki dergê ma keno ma gêni û ver bê millet a şanî. Tiya di heme tewir millet esta. Xwi ra na mesela belavokan ra zî fêm bina. Latîn Amerika bigirê hetanî Filîpîn, Kurdistan bigirê hetanî Afrika Başur herkes esto. Qorê imformasyon vila kenî, qorê peran ancenî pêser û

**Embazî heme payra vindertî xwi mîyan di tereqnenî. Qalî qaley 1'ê Gulani ya. Ma mîyan di gelek embazî nîzdî des serri yo Swedi di yî. Yanî serri- di serri rejîmdê eskeran ra pey Welat ra vejayî. Nê embazî behsê Welatî kenî, behsê lejê Welatî kenî. Yînî ra tay qetîamîdê 1977 di Meydana Taksîm dir bî, tay zî 1979 di, Bîtlîs di.**



gorê zî rojnaman û kovaran vila kenî. Herkesi bandrolê xwi akerdi. Şar do seet 13.00 di tiya ra rayir bikuwo şero cadê mittingi.

Alê (bêraqê) ERNK ê durî ra bereqenî. Ma şanî yînî het. Embazanê ERNK ê hewl tedarikê xwi dîyo. Gelek welatperwerî do ewro bi kontejdey ERNK ê reydi rayir ra şeri. Çend embazî belavokanê bi Swedlkî û Kurdî vila kenî. Kurdistan Rapport,

destê çend embazan dir a. Na kovari hergû aşmi bi Swedkî vejêna. Ciwan û gedey qumbezan reyra peran ancenî pêser. Nînan ra teber zî des- duyes bandrolê dergî destê embazan dir i.

Embazî heme payra vindertî xwi mîyan di tereqnenî. Qalî qaley 1'ê Gulani ya. Ma mîyan di gelek embazî nîzdî des serri yo Swedi di yî. Yanî serri- di serri rejîmdê eskeran ra pey

Welat ra vejayî. Nê embazî behsê Welatî kenî, behsê lejê Welatî kenî. Yînî ra tay qetîamîdê 1977 di Meydana Taksîm dir bî, tay zî 1979 di, Bîtlîs di.

ard nîkewtinî. Swedîjî emsar, pari ra vêşer ameyî pîrozkerdiş 1'ê Gulani. Hikumatê koalisyonâ Swedi wazeno gelek heqanê karker û kedkaran werterâ heweno. Nika ra tay heqê karkeran tepe girewtî. Cûka hergû roj ver a hikumatî muxalefet vêşî beno. Swedi di Sosyal Demokratian panças serri ra vêşer hukim kerdo. Sosyal demokratian gelek waran di girweyê başî kerdi. Ver a burjuwazî tay hetan ra karker û xebatkarî pawitî. No hikumatê burjuwazî nika wazeno, heqê karkeran ehenday serri di girewtî, yew raydi tepe bigiro. Ay semed ra, beyntardê çep û rastandê Swedi di, beyntardê pêtan û karkeran Swedi di, do lej gurr bibo.

Hezey hergû serri do no meydan di serekê Partiya Çep Lars Werner qise biko. Qisekerdişê serekî ra pey pîrozkerdiş 1'ê Gulani qediyêno. Labelê verê Werner'i yewna diyâna tenan qise kerd. Tira pey Werner ame mikrofoni ser. Werner qisekerdişê xwi di politikadey hukmatî ser o vindert û fikrê Partida xwi va. Xeberdayışê serekê partî ra pey şar hêdî, hêdî vilabi. Ebi gore bê vatis bê Partiya Çep vîst hinzar kes amebi mitîngdê 1'ê Gulani.

Helbet Stokholm di Sosyal Demokratian zî 1'ê Gulani pîroz kerdi. Mitîngê Sosyal Demokratian hina gird bi. Hewawo ki televizyon û radyo vatiñî, çewres hinzar ten mitîngê yînî di pêser biyo.

Zey hergû serri, televizyonê Swedi yerey pîrozkerdiş 1'ê Gulani, şaristan bi şaristan nawit. Heme cayan di Swedîjî emsar par ra vêşer keyandê xwi ra vecaybî teber. Kuçey û meydanê Swedî bi alandê suran reydi hina weş bîbî.

bikin? Bi milyonan karkeren me li derveyî welat in, belê ji welatê çar hezar salan reviyan e. Li metropoliten dijimin û bajaren Ewrûpa xizmetkariyê ji xerîban re dîkin. Bav bi hezaran km li dûrî zarokên xwe ye, zarok û jin ji serê beyanê û heya rojava çav li riya hatina karkerê belengaz in, digirîn, dinalin... û bê çare derbasî hundir mala xwe dibin, têra dilê xwe hêstiran bi şewat dibarinin...

Dijminê dagûrker, malbata Kurd ji her peritandiye. Birçî hîştiye û riya derve jê re vekiriye, bê guman armanc ew e ku gel û şoreşê ji hev biqetîne, şewyekî şerê taybetî ye.

Wê bi ci giyanê û bi ci dili karkerê Kurd 1'ê Gulânê pîroz bike? Cejna wî ya mein ci ye, kîjan roj e? Ji bo ku karkerê Kurd li Erebistanê, Istenbolê, Edenevê, Parîsê, Bonê... nebe berdestî û çopçi- mîxabin pirranî insanen me kolan û siqaqenê bajaren Ewrûpa ji gemare paqîj dîkin. Jinê me ji di malen wan de berdestî ne. Ji bo ku hineki rûmeta xwe biparêzin, mecbûr û bêgav in ku; vegerin welat û xwe li dora partiya xwe (Partiya Karkeren Kurdistan) biciyînîn. Dema ku welatê xwe rizgar kirin û ala xwe di nava alan de hildan, hingê dikarin mîna mirovan 1'ê Gulânê bi serbilindî pîroz bikin. Ji bilî vê riye, tu riye din li pêsiya me tune ne. Wisa ji dikare bibe giyana mirovahîya li ber candanê û çina proletarya...

## Dilê me jî dixwaze 1'ê Gulânê pîroz bike

### Dilbixwîn

Mîna ku volkanek di nava çavên ezmanan de biteqe, şefaqê zora xwe dabû ser tariya şevê û hêdî hêdî tîrêjîn xwe avêtine der. Weke ku hunermendekî nola Liyandarda Dafinshi ev ezman bi meraqê bilind çêkiribe, mirov dikaribû bi saetan ji xwe re lê temâse bike. Belê, ezmanekî wiha çeleng bû, te digot qey taceke zêrin daye ser seriye xwe û dixwaze di beyanâ vê rojê de bibe zava. Lê... ezê çi bikim, tevî vê çelengiya xwe jî nikare bi ezmanê welatê min re ku serê çiyayê mîna Nemrûd û Agriyê di nava hembêza xwe de vedişere, têkeve hawîrkanâ şemal û bedewiyê.

Min gelek caran xwest bi ser vî ezmanê biyaniyê de bikelim û mîna hozanvanan çend malikan bavêjime ser, mixabin dilê min lê venedibû, çiqas şerîn be ji, ne mîna ezmanê Kurdistana delal e. Rast e, çawa ku erdê (zemînê) biyaniyê nabe yê mirov, wisa jî ezmanê welatê biyani û xerîb nabin yê mirov.

Ez roj; roja 1'ê Gulânê ye. Rojeke pîr rûmetdar û bi nîrx e, rojeke muqeddes û pîroz e. Bi xwînê xwe bi dinyayê û mirovahîya daye îspatkirin ku karker ji

mirov in, ne koleyên kapitalizm û emperyalizma mijokdar in. Belê, troj "cejna karkeren cîhanê" ye.

Bi milyonan karker û xebatkar, li her çar aliyan cîhanê, bi dilekî ges û bi çavên tîjî hêstîren şâhiyê cejna xwe pîroz dîkin. Cejna karkeran li hemû karkeran pîroz be.

Em bi dorfirêhî li ser cejna karkeran nenivîsin, a jê pêwîstir ev e, karker di ci rewşê de ne? Zor gîring e ku bersiva vê pîrsê were dayîn, cîma? Ji ber ku heya em jiyanâ wan nasnekin, em nikarin giyanâ wan jî bizanibin, ji lewre divê em pîrsê bîbersivînîn.

Dema ku şoreşâ Cotmehê (Oktober) di 1917 an de bi serket, çîna karker nuh dizanî stirana azadiye lêv bike û bi roj û heyva çarde rojî re bikene. Proleteryaya ku di nava hêrsa kapitalizmê de hatibû perçiqandin û mîna koleyan dihate kîrîn û firotin, cara yekemin di rîveçûna jiyanâ xwe de, azadiya xwe di gesbûna şoreşâ Cotmehê ya Sosyalist de dît, ew şoreşâ ku bi xwîna 20 mîlyon şehîd di eniya mirovahîye de bûye rûmet û bilindiyeke bê bend û tixûb.

Belê, bi vî awahî sosyalizm di pişta-ne di sînga kapitalizmê de mîna kereke tûj hate çikandin. Karkeran bi mekutên xwe û cot-

karan ji bi dasen xwe, rûmeta xwe parastin û ji pêşerojê re bûne hêviya zefer û şerîfaziyê. Cara yekemin di jiyanê de, pişti koçbera civaka destpêkê, dema ku nuh lawir û insan ji hev diqetin, wekhevi tê rûyê dînyayê û karbidesi û serdestiya kapitalizma mijokdar, têtê pelixandin. Ev e cewher, "Hemû karkeren cîhanê bibin yek û zincirâ koletiyê biqetînîn."

Piştî 75 salan, em di sala 1992 an de ne. Ci hate serê çîna proleter, mirovahî di ci rewşê de jiyanâ dîbe, kapitalizm gihişte ci radde û serpîlkê...?

Kin were gotin, kelepora ku bi xwîna 20 mîlyon şehîd hatibû avakirin, bi destê çend bêroqraten ku laşê xwe yê genî di bin kîncen sosyalizmê de veşartibûn, hate pê listin. Xwe sipartin kapitalizmê û rûyê xwe li pêsiya dîrokê reş kîrin. Lê, dînya bê "Tewan û Tole (sûc û ceza)" namîne. Xwîna mîlyonan însan, wê di pêşerojê de, mirovahî lê xwîdi derkeve. Di nava hilwesandina "Sosyalizma Relî" de, çîna karker ji di bin piyan de, diperçiqe, edî li gora dilê xwe kapitalizm pê dilîze, gelo wê kî biçe hewara wê? Bi vî awahî dinâ li ser serê karkeran teng dibe.

Ne tenê çîna karker, jiyanâ tevayî mirovahîye di bin tehlükê de arzînîn, wê di pêşerojê de, mirovahî lê xwîdi derkeve. Di nava hilwesandina "Sosyalizma Relî" de, çîna karker ji di bin piyan de, diperçiqe, edî li gora dilê xwe kapitalizm pê dilîze, gelo wê kî biçe hewara wê? Bi vî awahî dinâ li ser serê karkeran teng dibe. Gelekî bas e, lê hema slogan û dirûşme tenê dikarin ci bikin!


Gelekî bas e, lê hema slogan û dirûşme tenê dikarin ci bikin! Dilê me jî dixwaze 1'ê Gulânê pîroz bike, lê çawa? Emê çawa û li kuderê vê cejna rûmetdar pîroz

Rewşa me hîn xerab û kambaxtir e. 1'ê Gulânê hat, karkeren cîhanê digirîn û diqirîn: "Biji 1'ê Gulânê!"

Gelekî bas e, lê hema slogan û dirûşme tenê dikarin ci bikin! Dilê me jî dixwaze 1'ê Gulânê pîroz bike, lê çawa? Emê çawa û li kuderê vê cejna rûmetdar pîroz

Bi ressama Kurd Kulîlka Hezaran re hevpeyvîn

# 'Rewşenbîr divê pêşî rastiya gelê xwe nas bike'



Kulîlka Hezaran

Ji kerema xwe re hûn dikarin ji bo xwendevanan xwe hinek bidin naskirin?

-Sala 1970 an, li bajare Agirî hatime dinê. Min dibistana pêşîn û navîn li wir temam kir. Niha li İstenbolê di dibistana bilind de Astronomiyê dixwînim.

We li İstenbolê sergiyeke resiman vekir, kîngê û li ku derê we ew vekir?

-Sergî di 18'ê Nisanê de li Navenda Çanda Mezra Botan ji aliye YKD (Komeleya Jinê Welatperwer) ve hate organize kirin.

Ji kîngê ve hûn bi resiman re eleqedar dibin, berê xebatên we yên wisa çêbûbûn an na?

-Dema min dest bi çêkirina resiman kir, hîna ez nedîcûm dibistanê, angô hîna çar-pênc salî bûm. Xebatê min ên wiisa berê jî, li dibistanê çend caran çêbûbûn.

Resimên we yên di sergiye de cih girtine di derheqê ci de ne, naveroka wan li ser ci ye?

-Resimên min ên ku di sergiye de hatine raxistin, bi taybîf têkoşîna jinê Kurd, bi giştî jî têkoşîna gelê Kurd tînin ber çavan.

Sedema ci, angô bi ci armancê we ev sergi vekir?

-Armanca vekirina vê sergiye pirralî ye.

Armanca me ya pêşîn; me xwest em têkoşîna gelê xwe û rastiya wê bi şeweyekî cihê di rûpelên dîrokê de bikolin.

Ya duyemîn; me xwest em nirx (qiymet) û hêjâhiyêñ gelê Kurd bi awayekî vekirî û eşkere, derxin ber çavan û xwe bi gelê xwe re bikin yek.

Ya sêyemîn; me xwest vê gihaneka dîrokî ya em tê de ne bi zanîn û kelepora xwe ya rewşenbîr bixemîn. Ez bawer im ev karê me di vî warf de wê bibe destpêkek. Em bi

"Li gora dîtina min, ji bo em li ser çand, huner û zanista Kurdi tesbîtên rast derxîn holê, divê em li ser hemû berhemîn Kurdi yên heta niha hatine afirandin, lêkolînên kûr bikin. Pêwîst e rewşenbîrên me yên iro pêşî vî karî bikin"

vê yekê rewşenbîrên Kurd vedixwînin (dawet dîkin) berpirsiyariyê. Em, rewşenbîrên Kurd vê berpirsiyariya xwe heta ku tînin cih û pêk tînin?

Bi rastî iro gellek rewşenbîrên me di ber xwe de hinék tiştan dîkin. Lî belê çiqas an jî heta kîjan derecê peywir (wezîfe) a xwe tînin cih, pirsgirêkîn esasî tînin ziman, ji bo çareserkirina wan ci dîkin û di vî warf de çiqas bi serdi Kevin? Divê li ser van babet (konu) an bê

ran ve. Bi vî awayî emê dikarîbin bala gelê Kurd bikşînîn ser van berhemîn (eserîn) ku bi navê gel hatine afirandin. Vêca ev berhem dê ji teref gel ve bêñ berxwarin û dure jî berhemîn nuh wê derkevin meydanê. Xebatê warê zanîtî û hunerî ku di aliye kan-tîfî (nîcelik) de bipêşve diçin, dê di aliye kalîte (nîtelik) de jî pêşveçûn û hilperîn (sîçrama) an derxin holê (meydanê) û pêşveçûna bajarvaniyê (medeniyetê) bi vî awayî dê bigihîje pêvajo (sureç) yeke jîndar û saxlem.

Ji bo ku ev xebatên wek yên we rabigîhin nava gel

riji vê berpirsiyar in.

Pêwîst e tiştîn wisa li her derê, ji teref rojname û kovaran ve bêñ ûlan kirin û mirovîn pêşverû bêñ vexwandin. Hetta ûlan û vexwandin jîne bes in, pêwîst e rewşenbîr û rexnegir (eleştirmen) ên me, di kovar rojname û semîneran de li ser van bizaftin (faaliyet) ên hunerî û zanîtî bisekinin, gotar û lêkolînan binivîsin, wan binirxînin, rexne bikin û bidin nas kirin. Lî, mixabin (maalesef) di vî warf de pirr-kemasiyê me hene. Gelê me di gellek waran de dikare pêwîstî û pêdivî (ihtiyacî) yên xwe tesbît bike, derxîne berçavan û çareser bike, lî belê ev warango warê hunerî warêkî cihê ye, ji bo vî warf râberiyeke taybîf pêwîst e. Berpirsiyariya vê râberî û pêşengiyê dikeve ser milê rewşenbîrên Kurd. Nemaze (özelliğe) di warê resimê de gelê me hewcedarê destek û pêşengiyâ ronakbîr (zana) û rexnegirîn Kurd e.

û diyar dibe ku xebatê hunerî û zanîtî ji bo gelê me pirr bi wate (mane) ne û pêwîst in. Ev xebat ji têkoşîna esasî re tempo digrin, sêviya wê bilind dîkin û wê dixemînîn.

Li gora dîtina min di aliye zanîna hunerî de di navbera gel û rewşenbîran de ferqeke kûr û mezin heye. Ma hûn bawer dîkin ku sergiyê wek yên we rê vekin û bibin navgîn (alet, araç) da ku ev ferqa mezin ji holê rabe û rewşenbîr û gel bikevin nav hev, ji hev fam bikin?

-Berf her tiştî, ez ne di dîtina we de me, ez bawer nakim ku di vî warf de di navbera gel û rewşenbîran de ferqeke welê kûr û mezin heye. Erê ferqek heye lî belê ev ferq ne asteng e ji bo ku gel û rewşenbîr ji hev fêm bikin.

Di navbera gel û rewşenbîrên hemû derêñ dînyayê de ferqek heye lî ev ferq hewçend ne mezin e. Mesela, ji bo civak (toplum) a Almanan jî ev pirsgirêk heye, ji bo civaka Fransız û civakê din jî pirsgirêk wilo heye. Lî belê ev pirsgirêk ne astenek e ji bo ku rewşenbîr û gel ji hev fêm bikin, û dakevin nav hev.

Em dibêjin gelê me geleki ketî ye, paş ve maye, lî belê divê neyê ji bîr kirin ku rewşenbîrên me ji têra xwe kefi ne, rastiya gel û rewşa welatê xwe baş nizanîn.

Ji hev dûrketina gel û rewşenbîran pirsgirêka hemû civakan e. Ev pirsgirêk ya civaka Kurd e jî û ev ji ya hemû civakê din dijwartir e li cem me. Ji ber ku rewşenbîrên civaka Kurd hêja bi zimanê xwe jî nikare bipeyive û bixe-bite. Rewşenbîrekî ku bi zimanê xwe yê zîmkârî nikaribe bipeyive di kîjan civakî de heye?

Kesî ev sosret li tu derêñ dînyayê û di tu civakê de nedîtiye.

Ji ber vê yekê divê pêşî rewşenbîrê Kurd bikeve nav gîrsen gel da ku gelê xwe nas bike, zimanê gelê xwe hûn bibe û rastiya gelê xwe bibîne. Li vir, li derveyê gîrsen gel, em çiqas jî ji xwe re bibin bûk û zava tu feyda wê tune. Heta mirov rastiya gelê xwe û rewşa welatê xwe nebîne, nas neke û tênegihêje (fam neke) nikare bibe rewşenbîr.

Di sergiyê de me dît ku gelê me xwe pirr nêzîkî berhemîn xwe dike. Dîsa me baş fêm kir ku em gavek ber bi gel ve herin wê gel du gav ber bi me ve were. Ji ber vê yekê pêwîst e rewşenbîr bi gelê xwe re bibin yek wek kulumek.

Heppeyvîn: Mizgin Nêrgiz



Hezaran: "Resimên min bi taybîf têkoşîna jinê Kurd, bi giştî jî têkoşîna gelê Kurd flîn ber çavan."

axaftin û guftûgo (munaqeşe) çêbin.

Li gora dîtina min, ji bo em li ser çand, huner û zanista Kurdi tesbîtên rast derxîn holê, divê em li ser hemû berhemîn Kurdi yên heta niha hatine afirandin, lêkolînên kûr bikin.

Yâ sêyemîn; me xwest vê gihaneka dîrokî ya em tê de ne bi zanîn û kelepora xwe ya rewşenbîr bixemîn. Ez bawer im ev karê me di vî warf de wê bibe destpêkek. Em bi

divê mirov ci bike? Di vê pêvajo ya dijwar de ji bo gelê Kurd xebatê hunerî wek resim, grafik, siîr, fotograf û hwd. pêwîst in an na?

Ji bo ku ev xebat rabigîhin nava gel û di nav gel de belav bibin, barê herî giran dikeve ser milê medya yê, angô (yanî) navgînên ragîhandînê yên girseyî (Kitî iletişim araçla-

Ku ev berpirsiyar bi şeweyekî ciddî were cih, ez bawer im dê gelê me pirr bi pêşkeve, hem berhemîn Kurd ji teref gel ve dê bêñ naskirin hem jî gel dê xwe nas bike, bi xwe bawer û ewle bibe.

Ji xwe gelê me jî di vê pêvajoyê de ci ji destê wî tê dike, enerjiya xwe hemû bi kar tîne. Ji van gotinêne yên jor jî derdikeve meydancı-

Yekîtiyi gotineke pirr fire ye. Bi sala ye, ku li ser vê gotinê gelek zêde tê axaftin û tê nivisîn. Gava gotina yekîtiyi tê holê, hin çarşîvîn (çarçove) klîşe bûyî hene, gelek kes xwe bi van klîşan nêzî vê gotinê dikin. Pirr kes hene, bixwe jî "ronakbir" in, lê vê pîrsê mîna berê, bi serê kevin digrin dest; bi vî awayî dixwazin "zelalî" bînin. Rewş û peşketina nûjen nabînin ya jî naxwazin bibînin.

Piranî dibêjin, çîma Kurd nabin yet. Bi baweriya wan yekîti yekbûna hêzên siyasi ye. Rast e; yekbûna hemû hêzên siyasi daxwazeke baş e, lê hêz, divê bi rastî jî hêzên ji nav gel bin, ne hêzin bin, ku ji çend kesen ji gel dûr pêkhatibin. Yekîtiya "parî û hêz" ên ji gel dûr, ji bo têkoşînê û pêşveçûnê tu mane ifade nake. Divê ew hêzên meslekî, ku şaxêwan di nav gel de ye bibin yet. Ev jî li Kurdistan fro gav bi gav pêk tê.

Ew hêzên li ser tê axaftin, bixwe jiyana xwe li pêş gelê Kurd hê meşrû nekirine, nebûne hêzên gelên xwe. Yekîtiyi naxwazin, tenê li ser yekîtiyi pîr diaxivin û dînîvisin, da ku ji bernama rewşenbîran der-

# Yekîtiya gel

## A. DÎKÎLÎ

grûpê dûr gel in. Ewêni de cih digrin dibê nûner û ber-pîrsiyarêne beşek ji gel bin. Iro em dibînin, ku di bin ala ERNK ê de gelê Kurd

**Şertê Kurdistan hêzên xwe derxistiye holê: Yekîtiya Rewşenbîran, Yekîtiya Jinan, Yekîtiya Karkeran, Yekîtiya Ciwanan, Yekîtiya Mamos- teyan, Yekîtiya Xwendevanan, Yekîtiya Zarokan, Yekîtiya Dîndaran, Yekîtiya Hunermendan (...) û hwd. pêk hatine. Divê hê yekîtiyên din jî pêk bê. Ew yekîti hemû di bin ala ERNK ê de gihiştine hev**

gav bi gav dibe yek, yekîtiya gelê Kurd gelek pêş ve çûye; pêkhatina wê hê jî pêş dikeve. Grûpê, ku vê yekîti û eniyê naxwazin bibînin û binasin, bi xwe hemû hûrîkburjuvayêni ji gel dûr in, em hemûya bicivînin jî yekîtiya gel, ya jî eniya gel pêk nayê. Ew têoriyên kenvare, li anegora rewşa nûjen derbas nabe, li anegora şertiên têkoşîna gelê xwe pêş her tişti dibîne, pêwîst e. Her kesî, ku ji bo gelê xwe di riya rast de, bi metodê rast keda xwe dirjîne, hêja ye. Kes kesî dûr gel naxe, naxwaze rê li ber kesî bigre, meydana têkoşîne fireh e, tenê hin kes û grûp xwe teng dikin, dixin tengasiya gotinê vala, ji çalakiyan direvin, û dixwazin vê revê jî bi durûşmîn tûj, bi

tankêni dijmin. Hûn vî nakin, bi kêmâyî li her derê propaganda vê rewşê bikin. Mafê tevgera rizgariya gelê Kurd nexwin, li ser vê rewşê pesnê xwe nedîn;

nebêjin hûn yekîtiye dixwazin nebêjin ERNK bila bi me re bibe yek, hûn pê re bibin yet. Rê li ber we negirtiye. Li her derê hûn dikarin xwe nêz bikin; bi durustî, bi dilpakî ji bo têkoşîna çalakî, ne ji bo axaf- tinê vala. ERNK yekîtiya gel pêk anîye, roj bi roj pêş ve di- be. Cihê herkesî tê de heye, hin şertên têvîlîbûnê jî divê hebin. Neyê ji bîrkirin, ku ERNK di jîyanê de xwe îspat kiriye, bi dost jî, dijmin jî xwe daye qebûlkirinê. Gavê pêş divê ew be, ku kes û grûpê din jî xwe bidin qebûlkirinê, rewşa xwe li hember ERNK jî paqîj derxin. Baweriya wê binin ser xwe.

Rexneyê mezîn divê li "rewşenbîr" ên, ku van gotinan di- germin, bê kirin. Berî herkesî divê ew ên "rewşenbîr" in li ba gelê xwe bin, bi tevgera gelê xwe re bin, li pêş gelê xwe bin; rîberî bikin. Eger mirov ne li ba gelê xwe be, bi ser de jî mîna mîmîzokan rexnegîr be, gotina mirov jî pere nake. Wê xelk guh bide mirov, dengê xwe neke, li pey mirov jî tinazê xwe bike, bêje ma "rewşenbîr" e, tişt nabe, bila biaxive. Bi vî awayî kes nikare ji pîrsîrêkîn gelê xwe re bibe çare. Mafê hîç tu kesî tune, ku rexnê xwe bi- ke, lê bi xwe jî xwe bide paş. Mafê "rewşenbîr" hîç tune. Maf ew e, ku mirov bikaribe rî li ber têkoşîna gelê xwe veke, ji çalakiyan gelê xwe nereve, bikeve nav gelê xwe; bi ramânî, ekonomî, siyasi diplomasî ji pîrsîrêkîn gelê xwe re, nete- weyî/ navneteweyî, çare bibîne.


Ez dixwazim bi hêviya tund bang li hemû rewşenbîren Kurdistan bikim, ku ew xwedî li têkoşîna gelê xwe bi rewşekî zelal derkevin. Xwedî li gel derketin xwedî li ERNK, ARGK, PKK derketin e. Bê van hêzên geleri yên Kurdistan, dijmin dikare hemû mafên hatine girtin di rojekê de paş ve bigire, gelkujiyeke mezîn pêk bîne. Rewşenbîr nikarîbin li pêş gelê xwe bimeşin, divê bi- karîbin li paş gelê xwe bi dilekî vekirî kaş bibin.

## XACEPIRS

Amadekar: Rasto Zilani

### Çepebast:

- 1- Sergoya  
Sertê, ku gelek gerilla yê kuşî tê de hatibûne  
veşartın. 2- Kesê ku alê hildigre./  
Gede, sebî. 3- Daxwes-  
tin, hezki-  
rin./ Remîl./  
Nepejirandi 8  
n. 4- Kar,  
xebat./ Xwe-  
dî nav./ Bi 10



erebî agir. 5- Sewâlên ku dizên./ Şerîlên teybê. 6- Tamar, kok./ Kal, îxtiyar. 7- Naveka pîrekan. 8- Cînavka ke- sane yekemîn pîrhejmar. Fu- ze, celebekî çekan. 9- Sînif./ Sembola Tantal. 10- Sembola Osmîum./ Navê neteweyekî li rojhilata dûr.

### Serejêr:

- 1- Orte./ Di serhildana Dêrsimê de hevaliya Seyîd Riza dikir, lê dawiyê pêre îxa- net kir û bû mebûsê Dêrsimê. 2- Şehîdî nemir, serokekî ser- hildana Dêrsimê, biraziyê Se-

yîd Riza, di wêne de tê dîtin./ Bi zaraveyeke kurdî baqîr, si- fir. 3- Li welat navê bajarekî. Cihê ku tîrî lê di- gihejin. 4- Sembola Zîv./ Qidûz, yê ji serî derketî.

5- Dema xweşîştinê tê bika- ranîn./ Rêgeh, diborêgehê keşt û balafiran. 6- Çol./ Per- galeke müzikê. 7- Bi erebî henek. 8- Cînavka kesane yê yekemîn./ Xwe avêtin, baz- dan. 9- Tirs. 10- Cihê gulaşa gayan. 11- Navê herêmekî li welatê me. 12- Sazkirina dengê enstrûmanan.

## BERSİVÊN XACEPIRSA HEFTİYA ÇÜYİ

Çepebast: 1- Qadî Muhammed. 2- Emare./ Ufe./ La. 3- Hîroşima./ Tîm. 4- Rn./ Na./ Aqar. 5- Dîlan./ Şîar. 6- Med./ Evîn. 7- Antî./ Aza. 8- Na./ Serma. 9- Zû./ Se. 10- Kedî./ Şa.

Serejêr: 1- Qehreman. 2- Amîn./ Enaze. 3- Dar./ Ddt./ Üd. 4- İronî./ Îs. 5- Meşale./ Es. 6- Avareş. 7- Humanîzm. 8- Afaq./ Naaş. 9- Me./ Aş. 10- Trî. 11- Elf. 12- Damar.



Divê mirov bikaribe rî li ber têkoşîna gelê xwe veke, ji çalakiyan gelê xwe nereve, bikeve nav gelê xwe; bi ramânî, ekonomî, siyasi diplomasî ji pîrsîrêkîn gelê xwe re, neteweyî/ navneteweyî, çare bibîne.

nekevin, li ser wan tîmî şirove bê kirin. Bi vî awayî bikarîbin xwe biparêzin, bêjin: 'va em dixwazin bi hev re yek bin, lê yê din nêz nabin, em ci bikin' (!). Haya gelê Kurd ji wan tûne. Divê rewşenbîr jî guh nedîn wan, li ser wan nedîn nestîn, ta bixwe bitemirin ya jî di nav tevgera rizgariya Kurd de cihê xwe bigirin. Divê em "rewşenbîr" baş biponijin: Gelo ci têkiliyê kes û grûpê ji gelê xwe dûr bi yekîtiye hene, em ev grûpan hemû komê ser hev bikin, ev ê bibe yekîti ya jî enî? Hin kes têoriyan li ser enî çedîkin, dibin tînin, ku ERNK mîna enî nebînin. Ji ber ku, ew li dervayê vê eniyê mane, naxwazin vê eniyê binasin. Enî ci ye? Enî ne komkirina hêz û

Kurdistan hîc nabe. Şertê Kurdistan hêzên xwe derxistiye holê: Yekîtiya Rewşenbîran, Yekîtiya Jinan, Yekîtiya Karkeran, Yekîtiya Ciwanan, Yekîtiya Mamos- teyan, Yekîtiya Xwendevanan, Yekîtiya Zarokan, Yekîtiya Dîndaran, Yekîtiya Hunermendan (...) û hwd. pêk hatine. Divê hê yekîtiyên din jî pêk bê. Ew yekîti hemû di bin ala ERNK ê de gihiştine hev. Kesek bixwaze li ser enî û yekîti gotûbêj bike, divê berê li ser vê rewşa nuh baş bifikire, divê serê xwe gelek fireh bigre, nexe hin tengasiyan. Divê mirov li ser tiştîn hene biponije, ne li ser kîfa dil û fantaziyan. Hevalna piranî dibêjin her kesek ji bo têkoşînê pêwîst e, rast e. Her kesê ku armanc û

**NEQUSK**  
Amadekar  
Aram Çem



Herkes siûda xwe bi destê xwe diafirîne (çêdike).

Sallustius

## Ji Nelson Mandela re nameyeke vekirî

Nelson Mandelâyê Berêz...

Gelê Kurd we şervanekî azadiyê dizane. Ne bi tenê servanekî azadiyê ji dizane. Gelê Kurd ji we û ji têkoşina we re herdem hurmet nîşan da, hûn hesibandin; digel ku bindest bû û hemû mafen wî jê habîbûn standin ji, disa dilê wî bi we re û ji bo we lêxist; lewra gelê Kurd doza azadî, wekhevî û serxwebûna gelên dinê, di riya aşîtiya cîhanê de hewldana herî rast û girîng dibîne.

Nelson Mandelâyê muhterem!..

Jiyana we bi şervaniya azadiyê derbas bû. Di vê têkoşina dûr û dirêj de tu car hûn newestiyan; tade, işkence, zilm, zor û girtigehan hûn ji riya we ya rast û têkoşina we ya piroz dûr nexistin. Bir û baweriya we ya xwirt û biryârdariya we ji gelên bindest ên dinê re bû nimûne. Têkoşina we ya mafdar, di demek dirêj de be ji piştgiriya gelên dinê stand. Edî ji demekî bi şûn de hûn ne bi tenê bûn, raya gişî ya dinê bi we re û li pey we bû. Di vê doza we ya mafdar de, li gelek deverên dinê Reş û Spî bûbûn heval û li hember nijadperestîya Spîyên Efrîqa Başûr hûn û Reşik diparastin. Gelê Kurd ji hûn parastin û hî ji we diparêze.

Nelson Mandelâyê hêja

Mirovku kiyana wî bi şervaniya azadiyê derbas bibe û di ser bist salan de di girtigehan de mabe, mirovku ku ji bo jiyane azad pêşkêsiya şer kiribe û mirovku dil dabe jiyane; bêguman ew bi rûmata jiyane azad baş dizane. Ji ber ku we bi rûmata azadiyê baş dizanibû û di riya didestxistina azadiyêde tu car hûn newestiyan, gelên dinê û gelê Kurd hûn wekî sembolek azadiyê ditin. Bêguman hê ji hûn wisa têr ditin.



Mandela û Demirel: Gelekî dûr, zêde nêzik

cargoşe erdê xwe li Rojhilata Nâvin welatekî dîrokî û dewlemeden e. Gelê Kurd di avakirina medeniyeta Mezra Botan de roleke mezin û gi-ring stand. Lî mixabin iro dijiminê gelê Kurd, dixwazin ku navê gelê Kurd û Kurdistanê ji holê rakin. Li dijî vê hovîtiyê gelê Kurd li ber xwe dide; çawa we li ber xwe dida ew ji wisa li ber xwe dide. Gelê Kurd tê nefikirin, tê kuştin, di qirkiran de derbas dibe lê dev ji şerî azadiyê bernade. Heya niha bi millionan endamên gelê Kurd di vê riyê de, di vê dozê de hatin kuştin, disa ji têkoşina gelê Kurd ranewesiyâ û dê heyâ serkeftinê ji ranewe.

Nelson Mandelâyê Berêz!..

Yek ji wan dewletê ku Kurdistan parvekirine û dixwaze navê Kurd û Kurdistanê ji holê raken Tirkiye ye. Bêbextiya herî mezin da-

tinên wî yê "Tirkek bedelî dinê ye", "Xwezi bi wî ku dibêje ez Türk im" li ser kevir û kuçikên Kurdistanê ji hatine nivisandin.

Di dinê de kêm kes bi qasî M. Kemal û Dewleta Tirk bi peyvîn azadî, wekhevî, demokrasî, mafen mirovî û rizgarîya gelan leyistine û dileyîzin. Ew bi listina van peyvan dixwazin rûreşîya xwe binixwimînin. Lî rûreşîya wan eşkere ye û li holê ye. Qirkirina Gelê Kurd û Gelê Ermenî li ber çavên tevê dinê hat kîrin. Ma ew hovîtiya ku ïsal di Newrozê de kîrin tevê dinê bi çavên xwe nedît?

Nelson Mandelâyê Hêja!..

Bi qasî ku me ji rojnameyên Tirkiye hîn kir, dê "Xelata Atatürk a aşîtiyê" ïsal bidin we. Ev xelat di sala 1990 an de dabûn sekreterê Giştî yê Neteweyen Yekbûyi Joseph Lüns. Sala çuyî ji dan Kenan Evrenê derbekar û faşistê ku bi hezaran gelê Kurd û Tirk kuştibû. Evren ji bo şoresgeran wiha digot: "Ma em wan didarde nekin xwedî bikin. Kenan Evren bi qaydê ku got kir; disa ji çavên wî ji xwîna gelê Kurd û Tirk têr nebû. K. Evren mirovku nijadperest û di şopa M. Kemal de bû. Bi rastî ji Xelata Atatürk wî heq kiribû. Ev Xelat herçiqas navê wê "Xelata Aşîtiyê" be ji, divê hûn Xelata Nijadperestiyê fêm bikin. Lewra Mustafa Kemal tu tiştekî ji bo aşîtiyê nekiriye; pirêzen wî yê despotî û nijadperestiyê li ber çav in.

Nelson Mandelâyê Aşîtiwxaz!..

Dewleta Tirk başûrê Kurdistanê dagîr kîriye û li dijî gelê Kurd şerêkî qirêji idomîne. Her roj li Kurdistanê mirovîn welatparêzên Kurd ji alî hêzên dagîrker ên Tirk ve bi hovîti têr kuştin. Lî gelê Kurd şerî natetwîne û riya jiyane di berxwedanê de dibîne. Berxwedan û serhildana gelê Kurd pêl bi pêl li çar alîyên Kurdistanê belav dibe. Raperînê gel tîrsa dilê dijimin zêdetir dikin. Bi kurteberî dijiminê gelê Kurd di neçariyê de ne.

Dewleta Tirk, li hember têkoşina gelê Kurd a mafdar, çiqas dije di platformen navneteweyî de bitenê dimine û prestij xwe winda dike. Rexneyen dezechen mafen mirovî û raya gişî ya dinê rewşa Tirkiye dijwartir dike. Lî disa ji Dewleta Tirk dev ji vê siyaseta xwe ya nijadperest û dagîrker a li dijî gelê Kurd bernade. Siyaseta qirkirinê roj bi roj zêdetir dike.

Nelson Mandelâyê Hêja!..

Ev Xelata ku dewleta Tirk dixwaze bide wc; gelek mixabin ne ji



Mandela û Beşikçi: Gelekî nêzik, zêde dûr

Şerî azadiyê li hember kolonyalist, dagîrker, nijadperest û kedxwaran tê dayin. Dema ku welatê mirov bindest û gelê mirov ji kole be, an mirov bi bêxîretî koletiyê dipejîfîne û an ji mirov bi serbilindî li hember wan hêzên ku jiyana mirov kirine jar dest bi şerî azadiyê dike. Yênu ku şerî azadiyê dikin ew bi mebest û merama hev dizanin; loma berî hemû kesî ew slavên germ ji hev re dişinîn û piştgiriya hev dikin. Ji ber vê yekê ye ku gelê Kurd ji we û ji têkoşina gelê we re hurmet nîşan da û nîşan dide.

Nelson Mandelâyê Berêz

Welatê Kurdan Kurdistan bi peymana Lozanê (1923) ji alî hêzên emperialist û dagîrker ve hat parvekirin. Kurdistan, bi 530.000 km.

mezranîn Komara Tirkiyê Mustafa Kemal bi Kurdan re kir. Di şerî Cîhanê yê Yekemîn de, pişîfî belevbûna İmparatoriya osmanî, M. Kemal bi Kurdan re hevkî kir û bi saya Kurdan Komara Tirkiyê damezrand... Lî ji demekî bi şûn de li sozên xwe xwendî derneket, Kurdan ku doza mafen gelê Kurd dikirin kuştî û da kuştin; bi hezaran Kirk ji welatê wan derxist û neşî kir Rojhîlatê Tirkiyê; pirîn wan di rian de ji birçibûn û sermayê mirin. M. Kemal pişî ku serhildanê Kurdistanê yên 1920, 1925, 1930 û 1937 an bi xwîna pelçiqand, hebûna Kurdan ji îñkar kir. Hovîti, êrişkarî û nijadperestîya M. Kemal sînor nas nekir. Di nijadperestiyê de Hitler û Müssölini ji wî zêdetir nebûn. Go-

tinên wî yê "Tirkek bedelî dinê ye", "Xwezi bi wî ku dibêje ez Türk im" li ser kevir û kuçikên Kurdistanê ji hatine nivisandin.

Di dinê de kêm kes bi qasî M. Kemal û Dewleta Tirk bi peyvîn azadî, wekhevî, demokrasî, mafen mirovî û rizgarîya gelan leyistine û dileyîzin. Ew bi listina van peyvan dixwazin rûreşîya xwe binixwimînin. Lî rûreşîya wan eşkere ye û li holê ye. Qirkirina Gelê Kurd û Gelê Ermenî li ber çavên tevê dinê hat kîrin. Ma ew hovîtiya ku ïsal di Newrozê de kîrin tevê dinê bi çavên xwe nedît?

Nelson Mandelâyê Hêja!..

Bi qasî ku me ji rojnameyên Tirkiye hîn kir, dê "Xelata Atatürk a aşîtiyê" ïsal bidin we. Ev xelat di sala 1990 an de dabûn sekreterê Giştî yê Neteweyen Yekbûyi Joseph Lüns. Sala çuyî ji dan Kenan Evrenê derbekar û faşistê ku bi hezaran gelê Kurd û Tirk kuştibû. Evren ji bo şoresgeran wiha digot: "Ma em wan didarde nekin xwedî bikin. Kenan Evren bi qaydê ku got kir; disa ji çavên wî ji xwîna gelê Kurd û Tirk têr nebû. K. Evren mirovku nijadperest û di şopa M. Kemal de bû. Bi rastî ji Xelata Atatürk wî heq kiribû. Ev Xelat herçiqas navê wê "Xelata Aşîtiyê" be ji, divê hûn Xelata Nijadperestiyê fêm bikin. Lewra Mustafa Kemal tu tiştekî ji bo aşîtiyê nekiriye; pirêzen wî yê despotî û nijadperestiyê li ber çav in.

Nelson Mandelâyê Aşîtiwxaz!..

Dewleta Tirk başûrê Kurdistanê dagîr kîriye û li dijî gelê Kurd şerêkî qirêji idomîne. Her roj li Kurdistanê mirovîn welatparêzên Kurd ji alî hêzên dagîrker ên Tirk ve bi hovîti têr kuştin. Lî gelê Kurd şerî natetwîne û riya jiyane di berxwedanê de dibîne. Berxwedan û serhildana gelê Kurd pêl bi pêl li çar alîyên Kurdistanê belav dibe. Raperînê gel tîrsa dilê dijimin zêdetir dikin. Bi kurteberî dijiminê gelê Kurd di neçariyê de ne.

Dewleta Tirk, li hember têkoşina gelê Kurd a mafdar, çiqas dije di platformen navneteweyî de bitenê dimine û prestij xwe winda dike. Rexneyen dezechen mafen mirovî û raya gişî ya dinê rewşa Tirkiye dijwartir dike. Lî disa ji Dewleta Tirk dev ji vê siyaseta xwe ya nijadperest û dagîrker a li dijî gelê Kurd bernade. Siyaseta qirkirinê roj bi roj zêdetir dike.

Nelson Mandelâyê Hêja!..

Ev Xelata ku dewleta Tirk dixwaze bide wc; gelek mixabin ne ji

serbest

Musa Anter

## Mesela 49'an

Cîroka me dirêj e, em di 1958 an de girtin, tu li lêrasthatinê binê; ku girtina me di 17'ê Çilê Pêşin de bû, yanî roja ku Mewlana Celaledinê Rûmî miribû. Me ji, ji girtin û işkenca xwe re digot Şebî Arûz, ji ber ku ji mirina Mewlana re ji dibê Şebî Arûz. Yanî şeva zavatiyê. Ev şev di emrê insan de şeva herî xweş e. Mifetîş MİT ê Ergun Gökdeniz tê Enquerê, ji xwe li Enquerê bû û wek Millî Guvenlik a niha teşkilatê hebû lê pirrê wan ne paše bûn, Celal Bayar, Adnan Menderes, Ruşti Zorlu û Serokê Kurmayê yên duyemin Cevdet Sunay bû. Ergun rapora xwe ji wan re dixwîne, dibê ku em hezar pêşkêşen Kurdan bikujin wê doza Kurdan bi kîmasî 30 salî li paşkeve. Celal Bayar dibê temam. Serokê Kurmayê duyemin ji wek wî. Lî wezîre derive Ruşti Zorlu dibê, heyran wele ez vê qebûnakim, ji xwe li derive em rûreş in, bi kuştina Ermeniyan, Ruman û Kurdan. Bi zorê vê birînê qesmuş girtiye ez nikarim cardin bixwîrînim û 1000 Kurdî bê mehkeme û qanûn bikujim. Tevfîkîlerî Turancî bû yanî bi zimanê niha Turkeşî bû, dibê hevalno hûn zanin bê ez kî me, erê ez dijminê Kurda me lê ku niha em rabin 1000 Kurdî bê mehkeme bikujin tarîf dê Kurdistan li ber me rabe û isyan bike, emê bi desten xwe Cezayîrê bînîn Tirkiye, ev ne xeta ye? Wê çaxê Cezayîrî li ber Fransa rabûbûn. Dimîne Menderes. Menderes dibê hevalno ji xwe ev tişteku ku di rapora MİT ê de ye cezayê wî idam e, da ku pêşî em ji wan 50 hebû bigrin bidin mehkeme qe-rara idama wan bide emê ji 50 idam bikin û paşê 50-50 emê hezarê xwe xelas bikin. Vê qerarê didin û li Enqera dagheha "Kara Kuvvetleri" 50 heb muzakereyên tewqîfî bê nav çedîkin û didin MİT ê ku navê kê têxyê dibe ya wî. Ji van 50 kesan yek jê ez bûm. Ev çîroka me ya 50 yan ku di çapemeniya (basina) Tirkiye de navê wê danîn 49 an ji ber ku hevalkî me Emin Batur di hucrê de bi işkence hate kuştin. Wextê em derketin mehkeme em man 49, ji ber vê yekê Tirkan û çapemeniya dinya ji me re gotin 49 lar yanî 49.

Ez vê dozê paşê binivîsim. Lî niha şaxekê ji vê mehkeme bînim ber çavên we. Ji ber ku em di hepsî de bûn di 1960 an de ixtîfil çêbû, edî raporê bi dizî hemû hatin mehkeme, yek jê ji wiha bû; MİT a Diyarbekirê di heqê min de raporek nivîsandibûn. Di raporê de wiha digotin. Erê Musa Anter niha hay ji xwe dike, tiştekî nake, lê li otelê, li loqantî, li sûkê û qehwa heçê ku wî dibînîn Kurdiî tê bîra wan. Hakim xwend li min nêrî û keniya, go Musa tu dibê ci? Min go, hakim beg ma ezê bêm ci, hema tu dibê ci bila a te be. Ma minê li Diyarbekirê çarşef li xwe kira ku kes min nebîne, ne we û Kemalê we çarşef ji kir qedexe (yasak). Ez ye-qîn dikim ku min çarşef li xwe kira wê cardin raporekbihata mehkeme we ica wê bi gotina M. Anter dikeve qiyafetek bêwir û sapik, eger hûn nexeyîdin qerar bidin we divê ji iro pêve ji bo ibret alemê ezê bi çarşef bigerim. Hakim keniya û got na lo, guh medyê, ev işe sewlariya ye.

Belê xorten Kurdan ïsal 60 sal e, ez bi van bêbavan re têkoşin dikim. Meqseda min ne ew e ku ez xwe mezin bidim xwiya kirin, lê min divê ev tişteku ku bi serê min hatine ji we re bibe dersekê.

Ev ji wiha.

bo xebat û têkoşina we ya ji bo azadiyê ye; lewra Dewleta Tirk şervanen azadiyê bi girtigehan û bi daran sepiyan xelat dike. Dewleta Tirk dixwaze bi vê Xelatê Rûyê xwe yê reş û desten xwe yê di xwîna gelê Kurd de ji raya gişî ya dinê vesêre. Gelek mixabin Dewleta Tirk dixwaze ku we ji armancen xwe yê nijadperest û dagîrker re bise.

Nelson Mandelâyê Berêz

Dr. İsmail Beşikçi bi xebatên xwe yê li ser Kurd û Kurdistanê tê naskirin. Ew ji mîna we bi salan di girtigehan de ma. Sala çuyî The Fund For Free Expressin (Weqfa Azadiya Gotinê) Xelata xwe ya sala 1991 an da İ. Beşikçi. Lî İ. Beşikçi ji ber siyaseta dewleta Amerika ya li dijî gelê Kurd û Kurdistanê ev Xelat nepejirand.

Nelson Mandelâyê Aşîtiwxaz

Gelê Kurd we şervanekî azadiyê

û dostê gelên bindest dizane. Bêguman we Xelat heq kîriye û Xelat herî mezin raya gişî ya dinê bi piştgiriya xwe daye we û gelê we. Bihîlin bila Xelata Atatürk bidin belengazên wekî K. Evren. Ev Xelat bi we nakeve; lewra hûn azadîxwazek rastin in. İ. Beşikçi Xelata The Fund For Free Expressin nepejirand. Hûn dê çawa Xelata dewleta dagîrker, nijadperest û despot bepejirin. Na Nelson manda-la; gelê Kurd naxwaze wênê we li gel M. Kemal û Kenan Evren bibîne.

Werin!.. Vê Xelatê nepejirin. Rûmeta azadiyê û dostaniya gelê Kurd di ser hemû tişî de ye.

Ku rojek riya we bi welatê şeran, bi dergûşa medeniyeta dinê bi Kurdistanê bikeve diyariyên ku ew û gelê Kurd ji pêşkêşî we bike hene. Bi silavên germ we û cermreşan himbêz dikim.

Mihemed Farqînî



# Dinya otonomîstan teng baweriya wan qels e

## Felat Dilges

Serokê Eniya Kurdistana Başûr, di 15'ê Çileya Paşîn de (15.12.91) civînek çêkirin û di vê civîne de biryar (qerar) hat girtin ku di bihara 92 an de li Kurdistanê hilbijartineke giştî bê kirin. Diviyabû ku ev hilbijartin di 3'ê meha Nîsanê de bihata çêkirin; lê berpirsiyaren cephê hilbijartine taloq kirin û niha qala meha Gulanê tê kirin.

Beriya hilbijartine serokê PDK-I M. Barzanî, li ser vexwendina dewleta Tirkîyê hat Enquerê; li wir bi berpirsiyaren dewletê re axîfî û ji Enquerê derbasî Ingilîstanê bû, piştî ku bi berpirsiyaren dewleta Ingilîstanê re peyivî berê xwe da riya Fransayê. M. Barzanî di derheqê hilbijartine de wiha dibêje: "Piştî ku Saddam mirovîn xwe yên idarfî ji Bakûrê Kurdistanê vekişandin li herêmê valahiyeke otorîte çêbû, em dixwazin bi hilbijartine vê valahiye tije bikin. Yanî hedefa me ne serxwebûn e, em dixwazin pirs û pirsgirêkên xwe yên hundîrîn çareser bikin" (Binêre: Armanc, Sibat 1992)

Ango M. Barzanî bi eşkerâyi dibêje ku bi hilbijartine armanc valahiya otorita ku bi vekişîna mirovîn Saddam çêbûye tijekirine. Em ku dizanîn li Başûrê Kurdistanê di ser cil salî de ye ku têkoşînek çekdarî heye. Di serî de ev têkoşîn li hember dewleta navvendî ya Iraqê ye. Nemaze otorita wê ya Kurdistanê. Mebest valahiya otorita Saddam tijekirin nîne, armanc bi hemû awayî ji holê rakirina vê otorîte ye. Lê mantiqa otonomîst di neçariye de ye. Lewra ev mantik tu car nafikire ku bi hemû awayî têkiliyên xwe ji hêzên mêtîngekar bibir. Herçiqas ew ji likî de bi wan re di ser de be ji, ji alî din de bi wan re di hinek têkiliyên din de ye.

Mantiqa daxwazîn otonomîyê ci ye? Ev mantiq di serî de parvekirina Kurdistanê dipejirîne û daxwazîn Kurdistanê serbixwe û azad rast nabîne. Ji bo parêzgeren otonomîyê Kurdistan hatiye parvekirin, sînor hatine kişandin û guhertina wan ne gengaz e. Bi dîtina wan, ji xwe hêza gelê Kurd ji qîm nake ku van sînoran ji holê rake. Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Iranê Ebdulrehman Qasimlo di hinek axaftinê xwe de wiha digot: "Ez û tevî çend hezar pêşmergên xwe nikarin qala serxwebûnê bikin; li Ewrûpa çend Kurd tê ba hev û ji serxwebûnê diaxîfin". Qasimlo bi gotinê xwe yên bi vî awayî diyar dikir ku dax-

*Otonomîst, ji qedera xwe ya bi destê xwe ta-yinkirinê ewle nîne. Ew nikare di dermafê xwe de biryaren girîng bistîne. Hergav hinek di dermafê wî de biryar distînin û ew jî stûyê xwe li ber van biryaran xwar dike. Lewra ew bi daxwaza otonomiyê hê ji serî de ji gelek mafê xwe yên jîyanî derbas dibe.*

waza serxwebûnê girêdayê xwe de parvekirine de, pirsa demokrasiyê û mafê mirovî çareser bibe, dê pirsa Kurdî ji hel bibe. Ji ber vê yekê ew naxwazin ku pirsa Kurdî ji vê çarçovê derkeve. Heke tevgera Kurd ji vê çarçovê derkeve ew ê jê re bêjin "terorist" û



Serokê PDK-I Mesut Barzani

tanê nayne ziman.

Ramanek bingehîn a parêzgeren otonomiyê ji ev e: Dijwarîya guhertina sînoran. Ew, sînoran sunî yên ku di Kurdistanê de hatine kişandin neguhêrbar dibînin. Berî her tîstî neguhêrbariya sînoran di

piştigiriya vî karf nekin. Ev tehdît otonomîstan ditîrsîne û wan bêtir ji rastiya Kurdistanê dûr dixe.

## Psîkolojiya otonomîstiyê

Mirovî ku otonomiyê di parêzîn tu car ji xwe û ji gelê xwe ewle nînin. Dinya wan teng, baweriya wan qels e. Ew hêza gelê xwe biçûk dibînin û hergav xwe dispêrin hinek hêzên din. Bi pirranî ev hêz dewletêne dinê yên ku xwedênegiravî "demokrat" in.

Otonomîst, ji qedera xwe ya bi destê xwe tayinkirinê ewle nîne. Ew nikare di dermafê xwe de biryaren girîng bistîne. Hergav hinek di dermafê wî de biryar distînin û ew jî stûyê xwe li ber van biryaran xwar dike. Lewra ew bi daxwaza otonomiyê hê ji serî de ji gelek mafê xwe yên jîyanî derbas dibe. Mafê heri bingehîn mafê çarenûsî ye. Otonomîst vî mafî naparêze û vî mafî ji xwe re zêde dibîne.

dirîn a dewletêne dagirker, ne Qasimlo li Viyanayê ji alî hêzên paşverû yên Iranê ve dihat kuştin û ne jî guftûgoyen di navbera Eniya Kurdistanê û rejîmê Seddam, bi salan dom dikirin.

Ger pirsa Kurdistanê bi awakî berfirehî di platformen navneteweyî de cih nastîne û nayê munâqeşe kîrinê, dîsa sedemek girîng a vê rewşê, pirsa Kurdistanê pirseke hundîrîn a dewletêne dagirker dîtin e. Em baş dizanîn ku têkiliyên dewletan, di warê navneteweyî û siyâsî de, bi berjewendiyen wan ên neteweyî ve girêdayî ne. Heya ku tevgera Kurd, xwe bi nasnâma xwe ya neteweyî û serbixe we nede naskirin û pejirandin, dê di siyaseta navneteweyî de piştigiriye xwirt nestîne.

Heya niha tirsek mezin a otonomîstan neguhêrbariya sînoran dewletan bû; lê wisa xwiya ye ku ev tirs tu car ji dilê wan demakeve. Yekîtiya Sovyet belawela bû; Yugoslavia bû çend perçe û beriya hemûyan jî yekîtiya Almanan pêk hat. Dinya ku digot sînoran dewletan nayen guhertin, iro yek bi yek serxwebûna neteweyen biçûk dipejirîne û pirrê wan neteweyan dibin endamê Neteweyen Yekbûyî. Di dora sîh (30) hezarî de bi nifusa xwe San Marîno iro endamê Neteweyen Yekbûyî ye. Gotineke pêşîyan a me Kurdish heye, dibêje: "tu di erda kirasê wî de herî". Ev gotin ji bo mezinîn ku bi qasî biçûkan bikêr nayen tê bikaranîn. De otonomîstno! Di dora cil milyonî de li nifusa gelê Kurd û di dora sîh hezarî de li nifusa San Marîno binêrin û wan rûbirû bikin!..

Serokwezîre Ingilîstanê John Major ji Mesûd Barzanî re wiha dibêje: "Di hilbijartina Kurdistanê Iraqê de ku di 3 yê Nîsanê de dê çêbîbe, milletê Kurd ci qerarê bigre emê wê qerarê nas bikin û emê piştigiriye bikin". (Binêre Armanc, Sibat 1992)

Samîmîbûn an nebûna John Major tiştek din e; lê ku serokê Eniya Kurdistanê dîsa jî bêjin "illa otonomî" û "em serxwebûnê naxwazin", dinya dikare ci bike.

Dema ku em rewşa dinê ya froyîn berçav bikin em dê bi hêsanî bibînîn ku ji 1920 an vir de tu car dewletêne dinê bi qasî iro ji serxwebûna Kurdistanê re amade nebûne. Hilbijartîn Parlementoya Kurdistanê Başûr keyseke dîrokî dike destê Kurdistan. Heke Kurd di vê hilbijartîn de bîrîya serxwebûnê bistînin û vê biryare biparêzin, dê dinya jî wan biparêze. Di demeke kurt de ku dewletêne dinê wan neparêzin, dê raya giştî ya dinê li pey wan be.

Heke mantiqa otonomîst pirsa Kurdî nekira pirsa hun-

# Dr. Nûredîn Zaza û destana Memê Alan (5)

## Koyo Berz

Rewşenbîrê hêja, nivîskarê mezin Dr. Nûredîn Zaza, di sala 1919 an de li bajarê Madenê hate dinê. Zarotiya xwe li Kurdistana Bakûr derbas dike. Xwendina xwe ya destpêkê li Madenê dixwîne û dûre di gel birayê xwe diçe Diyarbekirê, li wê derê xwendina xwe didomîne.

Piştî serihildana Şêx Seîd, malbata wan gelek zehmetî dikşîne. Bavê wî û birayên wî digrin û diavêjin girtîghehê.

Piştî berdana wan, ew tevî kekê xwe Dr. Nafiz xetê dîkin û diçin Cizîrê, Kurdistana Sûriyê. Li navçeya Cizîrê şûnwar (bi cih) dîbin. Piştî xwendina xwe ya Sûriyê, dixwaze bîghêje tevgera neteweyî ya Kurdistana İraqê. Lî mixabin tê girtin û wî digrin dîbin diavêjin girtîxana (hefsa) Bexda yê.

Piştî derketina ji girtîxanê, ew diçe Beyrûdê û li wir dest bi xwendina xwe ya bilind dike.

Dr. Nûredîn Zaza di xortaniya xwe de tevgera welatparêz a Kurdî de cihê xwe digre û di kovarê Hawar û Ronahî de jî nivîsa dînîvisîne. Kortê Kurdan dicivîne û ji bo welatekî serbixwe xebata xwe ya siyasi didomîne.

Piştî şerê cihanê yê duymîn ew diçe Swîsê (İsvîçrê) û li wir bi cih dibe. Li Swîsê, di zanîn geha Lozanê de xwendina xwe ya bilind temam dike û di warê pedagojî yê de doktoraya xwe

dike.

Di salêñ xwendekariya xwe de ew, ji bo cara pêsin, Komela xwendekarên Kurd li Ewrûpayê saz dike. (di sala 1949 an de)

Dengê Kurdistan, bi kurdî, fransizî û Ingilizî derdixîne.

Piştî xwendina xwe, rewşenbîrê hêja, welatparêzê xoşewîst vedigere Sûriyê û li wir tevî hin Kurden Niştimanperwer ve, di sala 1957 an de Partiya Demokrat a Kurden Sûriyê (PDK-S) ava dike.

Di du aliyeñ partiyê de kar dikir, di aliyeñ de jî bo masfîn Kurden Sûriyê xebat dikir, aliyeñ din de jî piştîrtiya şoreşa Kurdistana İraqê dikir.

Di sala 1960 an de dîsa tê gitin.

Dr. Nûredîn Zaza ji bo xebatê xwe yên Kurden, bi salan di zindanêñ Sûriyê, İraq, Urdin û Lubnanê de dimîne.

Di sala 1967 an de vedigere Kurdistan a Tirkîyê. Dadgeh û mîtîn Tirkîyê pê dihesin ku ew vegeriyaye Kurdistanê.

Hemû sazgehêñ xwe seferber dîkin û dikevin dû wî.

Ew diçe İstenbolê, cem heval û nasîn xwe, xwe vedîsîre.

Mîtîn Tirkan çer dike nikare şopa wî rast bike û wî bigre.

Hikûmeta Tirk wî ji hemwîlatiya Tirkîyê diavêje.

Di sala 1969 an de ew, dizivîre Swîsê.

Di sala 1970 an de li Swîsê wek multeciyekî siyâsî tê qebûl kirin û li wir dizewice. Ronakbîr û welatparêzê Kurd Dr. Nûredîn Zaza, li wir jî xebata xwe ya si-

yasî û Kurdfî berdewam dike û alîkarî dide şerê ji bo rizgariya gelê xwe.

Wî di rojname, radyo û televîzyonê Swîsê de doza Kurdfî diparast û di ber de jî bi kurdfî, fransizî û Ingilizî li ser Kurdanî divisand.

Dr. Nûredîn Zaza di sala 1988 an, 7'ê meha Çiriya pêşin de diçe heqiyê.

Dr. Nûredîn Zaza, ji bo pêşistina edebiyata Kurdfî gelek xebat kiriye û gelek berhem derxistine.

Wextekî dûr û dirêj li ser folkora Kurdfî xebitiye.

Dest bi wergerandina Fransizî ya Mem û Zîn a Ehmedê Xanî kiribû.

Bi zaravê Kurmancî destana Memê Alan û berhevókek bi navê Şerê Azadî çap kiribû.

Biranînê wî bi Fransizî bi navê MA VIE DE KURDE (jîyana min a Kurdfî) di sala 1982 an de li Swîsê derketibû û gelek deng dabû.

Rewşenbîrê hêja, nivîskarê mezin rehmetî Dr. Nûredîn Zaza yek ji hîmdar û piştîvanen girabîhagîren Enstituya Kurd bû.

Heta rojîn xwe yên dawiye xebata xwe her berdewam kîribû.

Dr. Nûredîn Zaza, ji bo serkevîn û pêşveçûyina gelê xwe, wiha dibêje:

Gelî Kurdan!

"Heke hûn naxwazin ji hev tar û mar û winda bibin, berî her tiştî, zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.

Lê heke dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û



Mem û Zîn

Mustafa Delioğlu

jîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin."

Dr. Nûredîn Zaza

## Folklor Botan (10)

### Dilan

Bi xwe helbest û awaz e, ji bo govendê ye... Li welatê me gelek texlîten govendê hene... Piranîya awazên bi vî rengî kurt in û pişkeka biçûk dirêj in mebest (meqsed) ji vî babetî berde-wambûn û coşkîrina govendê ye. Naveroka wê jî ya rengîn e û dewlemend e, lê stiranîne he-ne ku ti mane na din... Ev rengê ha gelekî sanahî ye û li her cihekî tête stirandin û li roj-helata navîn nav gelên dî jî baş belav bûye û şahîyen xwe pê coş dîkin. Weke Ereb, Asûrî, Ermenî, Tirk, Azerî, Turkmen û Israîlî û hwd...

Bi navdengtirîn govendênu ku baş li nik gelên dî belav bûne ev in:

1- Şêxanî, ji Botan, Hekarı û Behdinan

Şahmîranê hay Şahmîranê Hay Şahmîranê, Şahmîranê Me kêşa cok ji behra wanê Hay Şahmîranê, Şahmîranê Sê hezar pale wê berdanê Hay Şahmîranê, Şahmîranê Her palek zêrek danê Hay Şahmîranê, Şahmîranê Çavê min li bejna şax û şeng e Hay Şahmîranê, Şahmîranê Qehwa de giran e tam heft-reng e Hay Şahmîranê, Şahmîranê



Li welatê me gelek texlîten govendê hene

Wezê ci bikim dîwan teng e Hay Şahmîranê, Şahmîranê

2- Delilo, ji Botan û Silivan

İşev şevka baranê Delfilo Delfilo de seyranê

Cihka deyne li heywanê

Delfilo Delfilo de seyranê

Ji bo xatirkê razanê

Delfilo Delfilo de seyranê

İşev şevka berfêyo Delfilo Delfilo de seyranê

Cihka deyne li hewşêyo

Delfilo Delfilo de seyranê

Ji bo xatirkê xewşêyo

Delfilo Delfilo de seyranê

İşev şevka teyrokê Delfilo Delfilo de seyranê

Cihka deyne li ber cokê

Delfilo Delfilo de seyranê

Ji bo xatirkê keç-

kokê

Delfilo Delfilo de seyranê

Delil: kurek

Seyran: keçek

3- Govenda şerî (ceng) li deveren kurmancan bi nav-

deng e û bi taybetî Botan, Silivan, Hekarı û Behdinan.

Hey Botan Botan Botan

Ceng e li Cizîra Botan

Botan devera şeran

Ceng e li Cizîra Botan

Werin tola pismîran

Ceng e li Cizîra Botan

Ji zaxo (Derkê) heya Sêrê

Ceng e li Cizîra Botan

Bofî ne, li dawetê

Ceng e li Cizîra Botan

Kêfa me bi cengê tê

Ceng e li Cizîra Botan

Ha ha ha ha ha

Ceng e li Cizîra Botan

Çeka ji dijmin bistûnîn

Ceng e li Cizîra Botan

Cizîre ne çerînîn

Ceng e li Cizîra Botan

Yê em dikîn dê bînîn

Ceng e li Cizîra Botan

Ev erd e cihê me ye

Ceng e li Cizîra Botan

Kurdistan (Bedirxan) dilê me ye

Ceng e li Cizîra Botan

Dijmin bin lingê me ye

Ceng e li Cizîra Botan

Çavê min li bejna te ye

Ev stiran li Silîvan nîne, tenê li Botan

Esmer te digo we na kim

Yarê yarê ho yarê

Dilê te bi xem na kim

Yarê yarê ho yarê

Hoy dene loy loy loy

Soza yara xira na kim

Esmer min dilek heye

Yarê yarê ho yarê

Ew jî her jî bo te ye

Yarê yarê ho yarê

Hoy dene loy loy loy

Çavê min li bejna te ye

5- Hurzî, ji hemî deveren kurmancan

Ev stiran ji Botan e

Were were Şîrîno were were ha-

war

Ji bo te me dîno, ji bo te me dîno

Were were mala me were were

hawar

Were were bêhnxeşo were

were hawar

Tez kuştim çavreşo, tezkuştim

çavreşo

Were were mala me were were

hawar

6- Govenda Gul şenî (heşt pê)

Ji Botan, Hekarı, Behdinan û Torê weke stirana Gulşenî, Gulê hoynar

û hwd.

## Beşîr Botanî

Wezê ci bikim dîwan teng e Hay Şahmîranê, Şahmîranê

2- Delilo, ji Botan û Silivan

kokê

Delfilo Delfilo de seyranê

Delil: kurek

Seyran: keçek

4- Govenda Esmer, ji Botan û Silivan

# Gustave le bon û rewşenbîrê Kurd

Amed

Xelkê li Parîsê ji rewşenbîrê Kurdan re gotin "Gustave Le Bon" in (Pirtûka Elizabeth Picard, Hemîd û ên dinê, rûpel 105, binêrin). Gustave Le Bon (1841-1931) jî bijîşk û civaknaseki Fransiz bû. Pirtûkên wî li ser şaristani û psikolojiya kolektif hatine nas kirin. En ku ji rewşenbîrê Kurdan re gotine "Gustave Le Bon" in, xwestine bibêjin ku Sunî, Kurmanc, Ezidî, Soran, Elewî, Zaza, Neqşibendî, û ên dinê bi wan re psikolojiyeka kolektif çê bûne û ji tîrsa re tev bûne "Kurd". Tirkan ji me re gotin "Kirt, kirt, kirt, .... bûye Kurt" ji va nêrîna (têorî) jorîn geleki pêşketîstir e, çima wan di dawiya vî sedsalê 20 an de Kurd "mirovê prîmîttif" nîşan dane ku divê mirov wan ji nuh ve bike "milet". Tu mîletekî zanava wî jê bikşîni ji gazzirinê pîstir e, zanav

*A rast, ên ku ditîrsin û xwe dikin Kurd ne Goran in, û ne Kurden Şîî ne, lê ên mîna H. Hekîm in ku ji lêketina berjewendiyê xwe yên şexsî ditîrsin û amade ne nerastiye bibêjin da ku dijminan ji xwe razî bikin. Eger em li bêka (gora) mejîyê H. Hekîm herin, divê em bipirsin ku H. Hekîm Neqşibendî ye, an Qadirî ye. Ev deh sal in mamotoye, lê ji kurmanciya jêrîn pê ve zaravekî dinê nîzane. Belê edebiyata erebî baş dizane!*

Profesor Piyêr Lukok (Pierre Lecoq), zimannasê navdar, ji bo Kurdan semînarek li ser Avista û Zimanê Avîstî da. Pişî semîner tewaw (xelas) bû, keçikeka Fransizî bi navê "alîkariya mirovanî" çûbû Kurdistanê. Rabû ji Kurdekkî, navê wî Hilkewt Hekîm, pîsek kir. H. Hekîm jî ev bêtîrî deh salan e li Amûjgeha

xwe Kurd dibîne Kurd e..." De ka em binêrin berî hîngê H. Hekîm gotarek li ser Goranî di kovara "Debfîre, hejmar 1" de bi Fransizi ci nîvîsandiye. Gotara wî li ser helbestvanê Kurd Nâlî (Mela Xidîr Ehmedê Şaweyî Mîkayîf) ye: "Di pêş de, ji bo nîvîsandina helbestê du zarav ji aliye Kurdan de bi kar dihatin: Kurmancî li Bakûr, Goranî li mîrîtiya Erdelan (...) Nakokiyê (xîlafat) di navbera mîrîn Baban û Erdelan de ne-hîst ku Goranî bibe zaravekî edebî. Pê re devkiya Silêmaniyê berebere cih digre û dibe zaravekî edebî. Nâlî (1800-1856), Salim (1800-1866) û Kurdfî (1808-1848) bi devkiya Silêmaniyê honrawê (helbest) xwe nîvîsandin û Soranî bû ziman."

Gelo çawa mirov dinivîsîne ku Goranî zaravekî Kurdiye û paşê dibêje ku Goran ji tîrsa re bûne "Kurd"? H. Hekîm nêrîna dinê jî ji vî rengî bergîrî kiriye (dîffa kîrin). Elizabeth Picard di semînera (12.02.1992) xwe de dixwest bide xwiyan ku Sunî û Şîî jî mîlet in. Kurdekkî komunîst li dijî wê derket. Da ku H. Hekîm xwe xizmetkar nîşan bi-de, rabû wî bersiv li şûna jînikî bi vî awayî da: "Wisa ye. Ez nizanim li kîjan demê Suniyan ji Şîîyan re digot "em ê we wa bikin". Li Iranê, hinek Kurd xwe Şîî dibînin, ne Kurd. Eger Sunî û Şîî ne mîletin, lê ci ne?"!

A rast, ên ku ditîrsin û xwe dikin Kurd ne Goran in, û ne Kurden Şîî ne, lê ên mîna H. Hekîm in ku ji lêketina berjewendiyê xwe yên şexsî ditîrsin û amade ne nerastiye bibêjin da ku dijminan ji xwe razî bikin. Eger em li bêka (gora) mejîyê H. Hekîm herin, divê em bipirsin ku H. Hekîm Neqşibendî ye, an Qadirî ye. Ev deh sal in mamotoye, lê ji kurmanciya jêrîn pê ve zaravekî dinê nîzane. Belê edebiyata Erebi baş dizane!

Armanca çandina van nîşana ji niha de ji perçekirin û kolîkirina Rojhilata Navîn pê ve tiştekî dinê nîne. Kolî



Mirekî Kurd

tiştekî pirr pîroz e. Gava Kurdan dikujin û gaz dikin "Kurd" in, gava Kurd mafêñ xwe dixwazin "Nakurd" in. "Axay rî vanê" to rî imbarik bo", feqîri rî vanê "to rî kotî ra?".

A rast, gotina ku "Rewşenbîrê Kurd Gustave Le Bon" in, wan bêtîr ev gotina hanê bi veşartî ji Dîrêkторê Enstituya Parîsê, Kendal Nezan, re gotine. Heta ku derê ev gotina hanê derheqê wî de pirr rast e, em niha li ser nasekinin. Em ê nimûneyen teze nîşan din:

Li 26'ê Sibatê 1992,

# PÊNÛS

Amed Tigrîs



## Hikmet çû ser gora kalê xwe Alpertunga

Mirovîn herî xirab, yên bê şexsîyet in, ku binyata (esil û fesilî) xwe înakar dikin. Ango ew kesen ku dê, bav, malbat û adetîn xwe înakar dikin. Yen herî xirabtîn jî, yên ku welat û neteweyê (miletê) xwe înakar dikin û bi ser de jî, li dij hebûn û azadiya wan têdikoşin. Kesen wiha yên bê şexsîyet û bê qerekter in. Bi tenê berjewendî û qaryera xwe difikirin. Ango xwefiroş in. Ji bo kesekîn bê qerekter û bê şexsîyet tiştîn bi rûmet û nîrx tune ne. Bêşexsiyîfî û xwefiroşî ji wan re dibe xû û pîse (meslek). Kesen wiha demîna bêşexsiyîfî dîgrin. Cih û xebatênu ku tê de rûmetî, serbilindî û şexsîyetî hebin, ew kesen bêşexsîyet û xwefiroş dûrê wê cih û xebatê ne. Ango li ku însanîyetî, humanîzmî, qencî û azadî hebe, ew kes li dij nîrxen wiha ne.

Dema şerî neteweyî û çînî di welatekî de germ û geş dibe, ew kesen wiha yên bê şexsîyet û xwefiroş derdikevin an jî derdixin pêş û holê. Rewşa wan diyar û zelal dibe. Ji bekçîtiyê heta serokwezîtiyê dikarin cihê xwe di dezgehêne dewletê de bigrin. Dema Gandî li Hindistanê li dij emperyalîstan berxwedîda, yên ku bi dar û çekan li wî û hevalbendêne û dixistin, polîs û leşkeren Hindî yên xwefiroş bûn. Cezayîriyan dema li dij dagîrkeren Fransî serîhildan, dîsa hinek Cezayîriyan xwefiroş dest avetîn çek û li dij şerî xwe yên neteweyî, li gel Fransayê şer kîrin. Dema reşikîn Amerika li dij zordariya koletiyê serîhildan, dîsa reşikîn kole, hevalen xwe yên reşik, bi efendiyê xwe yên spî didan girtin û kuştin... Niha jî, li İraqê sembla bê şexsîyet û xwefiroşî Tarik Azîz bi xwe ye. Ew bi xwe ne Ereb e û ne jî musilman e. Navê musilmanan jî li xwe kiriye. Ji Ereban bêtîr propaganda erebî û musilmantîyê dike. Ew li der nûnertiya barbariya rejîma Saddam dike.

Ka em li Hikmet Çetin binêrin, ew Kurd e. Ji Licê ye. Ji mala Mehmo ye. Lî, ew jî wek hembajariyê xwe Süleyman Nazîf û Ziya Gökalp Tirkîtiyê dike. Ziya Gökalp teoriya Tirkîtiyê derxist û hembajariyê wî Hikmet jî iro wê di pratîkê de bi kar tîne. Hikmet Çetin çendekî berê bi Süleyman Demirel û Alpaslan Türkeş re çû Asyaya Navîn, serîdana dewletên Tirk. S. Demirel li wir li parlamento û meydanan didan zirt û fortîn tirkîtiyê û alayên (bayraqên) dewletên Tirk ên bira radîmisan û didan eniya xwe. Demirel digot "xwezi bi van salan." Ji Adriyatîkê heta Çinê dînyaya Tirk çêbû. Ci ferqa Ezerî, Turkmen û Tirk heye?" Tirşikçi Çetin jî, bi dil û can cepik jê re lê didan.

S. Demirel, A. Türkeş û H. Çetin çûn ser gora kalê xwe Alpertunga û kalê xwe ziyaret kîrin. Jê re fatîhe xwendîn. Duayêne neviyên Tirk qebûl bûn û kalê wan Alpertunga rabû û di gora xwe de rûnişt. Bi xêr hatina neviyên xwe yên Rojava Kir. Alpertunga li neviyên xwe yek yek mêzekir. Oyyy oyyy! ci guhertînîn fizikî di neviyên wî de çêbûne. Bi taybetî di neviyên wî Hikmet de, ci hikmet hene... Di şûna çavên şûjin de çavên beloq çêbûne. Poz mezin wek xiyar. Serê gîlover ci dirêj bûye. Rengê zer jî esmer bûye. Dudiliyê Alpertunga girt. Lî, birayê wî Süleyman û Alpaslan gihiştin alîkariya wî. Ji kalê xwe re sondxwarin ku birayê wan ê heqîqiye.

Bakûr be, eger li Kurdistana Başûr be, iro hevalbendêne dagîrkeren welêt wisa difikirin. Ne ku ew berketiyêne Kurmancan in ku ne Kurd in, an ên Soran in ku ne Kurd in, an ên Goran in ku ne Kurd in, an filan partiya Kurdî ne demokratîk e, wekî dinê, a wan ku Kurdan bi vî rengî careka dinê perçe bikin, careka dinê bindest bikin û ji serxwebûnê bêpar bikin. Berê Apê me, Osman Sebrî, gotiye ku "gava dijmin karekî bikin, bi destê rewşenbîran dikin". Vêca, Hüma kî şas nêkero, şas keno, erd ra kaş nêkero (Xwedê mirov şas neke, şas kir, bi erdê re kaş neke.)

# Têkoşerê bênav Fehmî Bîlal

**Izreddin Hemdem**

Min dema nivîsa mamoste Abdurahman Durre bi navê Azadi di Welat hejmara 9 an de, li ser Fehmî Bîlal Lice xwend, min xwe negirt, hema rahişt pênûsê û tiştên ku min di derbareyê Kurdê têkoşerê bêdeng Fehmî Bîlal de bihîstibûn nivîsi.

Di dîroka rizgariya neteweya Kurdistanê de gelek têkoşerê bi nav û deng hene. Ji vana hinek jê nivîs û pirtûkên wan çap bûne, mirov dinase û hinek jî bênav şer kirine, navêwan li cihan ne hatiye nivîsandinê, ji ber wî mirov baş nas nake. Ji van têkoşerên bênav yek jî Fehmî Bîlal e

Di 1983-84 an de li Şamê, carna ji bo dersa zimanê Kurdi ez diçüm ba Osman Sebrî. Apê Osman Sebrî wê demê li dor 78 salî bû. Li gor wî pîriya xwe, bi eşq û heyecanê ders didane me. Tê bîramin dema tipê (herfê) Kurdi dînivîsandin desten wî dilerizyan, lê cardin bi dil û can tipen xwe li ser kaxiz wek nexş çedikir û bi diqet xêz dikirin.

Li aliye din Apê Osman Sebrî wek dîrokek jînde, ji 1929 an û vir de li Sûriyê û li Lubnanê jiyyaye. Demek di Partiya Xoybûnê de kar kiriye. Gelek têkoşerê Kurd di vê rê de çûne û hatine. Rojek min hewl da, ku ez ji Apê Osman Sebrî di derbareyê Fehmî Bîlal de hinek tiştan seh bikim. Ez hema raste rast ketim pîrse:

-Apê Osman, min li welat di derbareyê Fehmî Bîlal de hinek tişt li ser têkoşîna wî bihîstibûn. Lê, li vir derveyî welat de min çend pirtûk û kovar li ser dîroka

Di dîroka rizgariya neteweya Kurdistanê de gelek têkoşerê bi nav û deng hene. Ji vana hinek jê nivîs û pirtûkên wan çap bûne, mirov dinase û hinek jî bênav şer kirine, navêwan li cihan ne hatiye nivîsandinê, ji ber wî mirov baş nas nake. Ji van têkoşerên bênav yek jî Fehmî Bîlal e

Kurdistanê xwend. Lê ci mixabin, ez qet li cihkî rastê navê Fehmî Bîlal nehatim. Tu karî ji min re hinek qala wî biki?

Min dît, ku Apê Osman di vî warî de xwestok e. Hema cih da destpêkir:

-Belê, Fehmî Bîlal katibê Şêx Seîd bû. (Di navê de gelek pesnê Şêx Seîd da; mîrê mîra ye, sîrê Kurda ye û hwd. Hinek istirî ji çavê wî hatin.) Rast e, navê Fehmî Bîlal di pirtûkan de tuneye. Pirraniya van pirtûkan ji aliyê mîr û axayan de hatine nivîsandinê. Ew jî tenê behsa xwe û yên wek xwe kirine. Eşîra Fehmî Bîlal tuneye, kurê mîr û axayan jî nîne. Ji ber vî behsa wî nakin.

Di pey re Apê Osman Sebrî di derbareyê Fehmî Bîlal de du bûyer (hadise) qal kir; a pêşî wiha ye:

Dema Fehmî Bîlal katibê Şêx Seîd bû, li der û dora Şêx Seîd, di nav hinek şêx û mîran de, cih bi cih aciziye li dij Fehmî Bîlal peyda dibe. (Ji ber ku Fehmî Bîlal bi dîfînê xwe materyalist bûye.) Vana rojek nerehetiya xwe ji Şêx Seîd re diyar dîkin û dipirsin; ka çima Şêx Seîd Fehmî Bîlal kiriye katibê xwe? Şêx Seîd li ser vê pîrse tenê viya dibêje:

-Fehmî Bîlal Kurd e.

Ya din jî wiha ye:

Rojek, dema serhildanê eskerê Şêx hatine dora bajarê Diyarbekirê girtine. Li vir Kurd, dîkin nakin nikarin têkevin nava bajêr. Eskerê Tirkan li ser bedenê (sûr) top û tifingên makînelî danîne û ji cihê dinê jî eskerê xwe teqwiye dîkin. Tam di vê demê de, Şêx Seîd û heyeta dora wî rabûne limêj dîkin. Paşê ji rûnidîkin dua dîkin. Ji ber ku duayêwan gelek dirêj dajo, bi taybetî Fehmî Bîlal aciz dibe, xwe nagire û dipirse:

-Şêxî min! Tirk xwe amade dîkin, gula li ser serê me direşînin. Em jî gerek hinek tedbîran bigrin, planan çêkin. Lî ez dibînim ku hûn runiştine duan dîkin.

Şêx Seîd xwe aciz nake û wiha bersîv dide:

-Ji bo ku em nikarin tiştekî dinê bikin, lewma em jî dua dîkin.

Van her du bûyerên ku Osman Sebrî qal kir, hinek şexsîyeta Şêx Seîd û Fehmî Bîlal tîne ber çavan. Şêxek mirovez, weletperwer û weletparêzek materyalist, ji bo rizgariya weletê xwe çawa karibûne bi hev re ewqas nêzî hev kar bikin. Ev rewş, ji pîvanê weletparêziyê remânak (numûneyek) gelek giranbûha ye.

## Wêneyê (fotografê) Kurdistan (1991)



Sal, 1980 12'ê Ilonê. Rojeke tarî û destpêka zilmeke xedar û hov. Pişti derbeya cuntayê zilma çendsed salan ku li ser gelê Kurd hatiye meşandin, bi şewyeke din, bi şewyeke faşîstî, qirkirin ji nuh ve destpêkir. Edî mirov li serê kuçan, di malên xwe de, ci li gund, ci li bajaran dihatin kuştin. Tu maf tu qanûn tune bûn. Yek qanûn hebû ew jî ji nav herdu lêvîn qomutan ci derketa ew bû. Qala zindanan bi serê xwe neynîkê vê dîroka tarîye.

Iro ci guheriye? Ji alî zilmê ve tu tişt! Lê ev rewş li berxwedaneke xwirt qelibîye û di xaleke pirr dijwar de ye, ketiye riyeke asê.

Pişti destpêka bexwedana 1984 an dewlet bi hemû hêzên xwe û bi hemû derfeîen (imkan) xwe giraniya xwe da ser Kurdistanê. Gel hêdî hêdî ber bi refen xwe ve dimeşîya. Ji tirsa zîndanan û mirinê xelas dibû. Dewlet weke hercar dîsa xwest Kurd bi Kurdan bide kuştin, cehşî (korucu) derxist hember wî, lê ev jî feyde nekir, berxwedan bi serhîdanan bi tac kirin û ev sistem bi rîberiya serokatiyeke rast hate pelisandin. İca dora Kontrgerilla bû, ku qirkirineke vekirî li ber çavê dînyayê dimeşandin. Di serhîdanan de di cenazeyen

gerîllayan de agir direşandin ser mirovan, bi sedan zarok, xort, jin û pîr kuştin. Lê ev meş dom dîke, qirkirînê Kontr-gerilla û Hizbul-Kontrayan jî pere nake, wê neke jî.

Ev pirtûk belgeyeke ji van qirkirin û bûyeran re. Ji teref Komeçîn mafen mirovan (IHD) liqen Kurdistanê hatiye amadekirin û di nav weşanên MELSA de hatiye weşandin.

Pirtûk bi pêşgotina weşanxanê destpêdike. Di vê pêşgotinê de, bi kurtî têkiliyê di nav mîtingehkar û mîtingehan de tê

şirovekirin û ji Kurdistanê jî çend mînakên balkêj ji xwendevanen re tê pêşkêşkirin.

Pêşgotina duyemîn ji pînûsa Mamoste İsmail Beşîkçi hatiye nivîsandin. İsmail Beşîkçi di destpêkê de li ser amadekirina pirtûkê radiweste û di ber de jî qala serpêhatiyen xwe dîke. Mamoste li ser xebatîn komeleyen mafen mirovan (IHD) û li ser rewşa wan, bi taybetî jî liqen Kurdistanê, ku di kijan astengîyan de dilivin jî disekine.

Pirtûk mîna wêneyekê (fotograf) mirov bi rastîniyê Kurdistanê re rûberû dîke. Û mînakên xwe hemû bi belgeyan radixe pîş çavê dînyayê.

Pirtûk jî 7 beşan ava bûye, her besek jî di nav xwe de bi çend ser navan hatiye parvekirin. Ev bes: 1- Mafî jiyanê; 2- Hiqûq û li herêmê rîveberiya taybetî 3- Di 1991 an de binçavkirin û işkence zêde bûn û domkirin. 4- Bêmirovhiştina herêmê didome. 5- Operasyona gel ji hev biyanîkirin, cehşî (koruculuk) 6- Sirgûnen weletê xwe 7- Hiqûqa navneteweyî bi operasyonen pişxetê tê ihlalkirin û gotina dawî.

Divê ev pirtûk bê xwendin û ji bo rojê pêş, ji bo ku zarok û neviyê me ji buyer û qirkirîn van rojan haydar bin mina mîrakî bê veşartin.

Kemal Baran



Abdurahman Durre

## Çawa xaliq e wisa jî mehlûqê wî ye

Dibêjîn ku Firewn dêwa xwedêtiyê dikir. Xelkê wî jê re gotin: "Madem tu dibêjî ez xwedê me, divê tu tiştekî candar çebikî, ku em bibînin û bawer bikin tu xwedê yî." Firewn dibêjî: "Sibê werin ezê nişanê we bidim." Firewn ew şev difikire ku silekî rêx deye cihekî, mozekî rêxê têxe binê wî biveşêre û ji xelkê re wisa bide nişan ku wî ew moz çêkir. Sibehê xelk li cihekê dicivin, Firewn gazî wan dike, dibêjî werin vêderê, xelk diçin cem Firewn, temaşe dîkin ku silekî rêx li wê derê ye. Firewn dibêjî: "Mêze bikin, ez ê niha ji we re mehlûqekî (Zirûhekî) Çekim. Xelk lê dicivin, Firewn kumê xwe datîne ser wê rêxê, dibêjî: "Pişti demekî hûn mêze bikin, ku ezê ferman bikim wê zirûh (candar) ek çêbibe." Demek di ser de dibihure, Firewn dike gazî dibêjî: "Çêbe." Ü kumê xwe ji ser wê rêxê hildide, moza rêxê ji binî dertê. Firewn dibêjî: "Eva min ji we re candarek çêkir, xelk dengê xwe dernaxe, mirovek ji nav wan radibe, dibêjî: "Çawa ku xaliq e wisa jî mehlûqê wî ye."

Em jî dixwazin ku ji xwendevanen hêja re bibêjî: "Çewa Tirkîye ye wisa jî edaleta wî ye."

Berya heft salan li Bingolê, qeza (navce) Gêncê, cenawerên xwînxwar û hov, Bînbaşî Ali Şahîn, Astsubay Mehmet Acar, İbrahim Yıldızgören û Suat Akova bi işkence û hovîti mamosteyê Kurd Siddîk Bilgin kuştin û cenazê wî nedan mirovên wî. Hezar vir, derew û galegal avêtin ortê. Rojnameyên bê şeref jî, bi devê wan cenaweran nivîsin û rastiyê veşartin. Hetanî iro (28 Nisan 1992) ku min di rojnameya Hürriyet û Cumhuriyet de dît, ku wiha dînivîsin: "İşkenceci binbaşî ve astsubaylar birer yıl ağır cezaya mahkum oldular, yargıtay bu cezayı onaylarsa, infaz kanunundan yararlanarak 73 gün hapis yatacaklar." Maşallah, sed maşallah ji edaletê re.

Eger ku yekî, yek ji wan işkenceciyên hov û cenawer bikuşana, gelo wê cezayê wî jî salek bûna an sed sal bûna, an wê idam bûna. Gelo wê rojnameyên faşîst çilo manşet biavêtanâ. bi ihtîmaleke mezin wê wiha binivisandina: "Canavarlar bir binbaşîyi şehît ettiler/ Caniler azdilar, şehitlerin kanı yerde kalmayaçak... Ühwd." Wê bi rastî jî bi sedan mirovên mesûm, jin û zar perîşan bikirana.

Em dîsa jî bêjî "Çawa ku xaliq e, wisa jî mehlûqê wî ye." çawa ku Tirkîye ye wisa jî edaleta wî ye.

Dema ku min ev nivîsan dînivîsi, televîzyonê ji Ozbekistanê ev gotina Demirel digot: "Herkes, her millet kendi kaderini tayin etmek hakkına sahiptir, hiç kimse buna karşı çıkamaz." Min ku ev gotin ji televîzyonê sehkîr ev hat hişê min, gelo Demirel ku van gotinê wiha qelew dibêjî, ew bi xwe jî bawer dike ku durûtiyan nake û dualî naleye, an na? Gelo gelê Kurd jî ku mafen xwe yên insanî û demokrasî bixwaze, an 'xwedê dûrke' ku heqê tayîna qedera xwe bixwaze, wê zatê mubarek ji wan re jî wilô bi insaf be û demokrat be? Ci bêjîm belkî jî dinya hatiye guhestin, lê min ne bawer e ku mîjiyê İspartalizade Demirel, Turanîzade Türkçe, Kurdzîzade Ecevit, Paşazade Erdal, Erebzade Necmedin xoce bîn guhestin, lewre di Tirkîye de hê doxtorên ku mîjiyân bughêzin ranebûne. Belê baweriya min ew e, ku wê ew dem jî were. Lî ci wext? Di Quranê de Ayeteke bi vê maneyê heye: "Li hîviyê bimînin, em jî bi we re li hîviyê ne."

Hîviya me ew e ku ev rojê ronayî bi zûti werin. Em bi rûyekî rûsîpîti, ji mîjiyê hov û cenaweran xilas bin, bigîhîn mejiyê insanî û demokratik. mîjiyê kohne û genî ji nav me rabin, em ji weke gelên demokrat yê cîhanê bi mafen insanî şâ bin, ji hev re weke bira bin ne weke cenawer û gura bin.

Dîsa jî hîvi dikim ku di nêzîk de doxtorên mîjîguhestinê di Tirkîye de çêbin. Mîjiyê nivîskarên weke Coşkun Kırca, Oktag Ekşî û Uğur Mumcu bîn guhestin, hê ku bi tevayî weke mîjiyê ilicakî cilq nebûne û imkana emeliyata wan dibe.

Kî dizane, belkî ew roj jî were, ku tip (doxtorî) wilo pêşde here, bikaribe mîjiyê 'hemsiyan' ji bughêze. Lî belê min ne bawer e ku tu kes dikaribe mîjiyê bîmîjiyân bughêze. Lewra tune ku heta bî guhestin. Wek nivîskarê rojnameya 'Tirkîye'yê, ku navê wî Mirkelamoğlu yan Sîrkelamoxlî ye, ci ziqûm e ku zirte zîta wî ye hê jî dibêjî Kurd tune ne.

HART HURT!..



# Çîroka şêr û rovî

## BERHEVKAR: RÜKEN BAXDU

bixwin. Bila ev navda-  
nîn bibe sebeba xwari-  
na wan." Şêr bi vê ti-  
nazê xapiya, go baş e.  
Destpêkirin.

Carekê zivistanek pîr-  
serma derbas bû. Berf  
pîr bariya. Şêr, rovî,  
gur, hirç, ker, kîroşk û  
kew tev bi hev re xwe  
ji ber berfê xistin şikef-  
tekê de. Di vê navê de  
berf jî pîr lêkir. Devê  
şikeftê girt. Tev bi hev  
re asê man û çiqas roj  
derbas bûn ew jî birçî  
bûn. Rovî bi dizî şêwra  
xwe bi şêr re kir. "Em  
di vir de girtî bimîn  
emê ji birçîna bimrin.  
A baş ew e ku bi wesîta  
listikekê em heryekê  
navekî li xwe deynîn,  
ên ku kêfa me ji navê  
wan re nehat em wan

Kîroşk "ez kîroşk im  
qûn beroşk im, xweş  
hevroşk im."

Kew "ez kew im av  
li dew im."

Ker "Navê min ker e  
hevsarê min zer e, elba  
ceh li ber e."

Hirç "ez hirç im qûn  
bi pirç im."

Gur "ez gur im diran  
bivr im."

Şêr "ez şêr im  
mîrekî xweşmîr im."

Bû roja dî, yekcar  
birçibûn. Rovî çavê  
xwe ji şêr re şikand û

berê xwe da kîroşkê.  
Go "Wisa nabe kîroşk  
e încâ qûn be-  
roşk ci ye? Welle emê  
wê bixwin." Rabûn tev  
bi hev re ew xwarin, lê  
neket ber diranê wan jî.  
Rovî roja dî încâ go

"kew kew e încâ av li  
dew e ci ye? Welle emê  
wê jî bixwin, kew jî  
xwarin. Rojeke din jî  
derbas bû ji bo ji birçî-  
na nemrin lazim e xwa-  
rin bixwin. Dor hate  
kerê. Rovî go "Ker ker  
e hevsar zer e încâ elba  
ceh li ber e ci ye? Wel-  
le emê wê jî bixwin."

Goşte kerê sê roja têra  
wan kir. Hingî derê şî-  
keftê ji berfê hatiye gîr-  
tin nikarin deren derve

û ji birçiya hevdû dix-  
Rovî go "Hirç hirç e încâ  
cûn. Ezê herim du pe-  
zan ji tere bigrim. Wê

ca qûn bi pirç ci ye?  
Welle emê wê jî bix-  
win." Ew jî xwarin.  
Gava dor hate gur, rovî  
dîsa go "Gur gur e încâ  
diran bivir ci ye? Welle  
emê wê jî bixwin."

Tev xwarin xelas ki-  
rin. A paşî man rovî û  
şêr bi tenê!..

Şêr berê xwe da rovî  
go "Rovîyo ez birçî me  
încâ tê ci bidî min?"  
Rovî tirsîya. Nizane wê  
çawa xwe ji destê şêr  
xelas ke. Rabû go  
"Şêrî min ez vê sibhê  
çûm derve ji bo ez mî-  
za xwe bikim. Malikê  
tu mîrat nebî! Ew ci  
ye? Kerîk pezê koçera  
ku ne serî û ne binî...  
Min dî derbas bûn û  
çûn. Ezê herim du pe-  
zan ji tere bigrim. Wê



têra te û heftîyekê bi-  
ke."

Şêr jî go "Bila be".  
Rovî ew xapand û der-  
ket. Çawa derket der-  
neket go lingo ez qur-  
bano û bi alî çiyê ve re-  
viya. Derket serê çiya  
dît ku bihar hatiye, her-  
der şînahî û kulîlk' in.  
Du roja li wê derê ma û  
bîna xwe derxist. Li  
der û dorê xwe nihêrt,  
dî ku şêr hêdî hêdî bi  
alî dehlê ve diçe. Ji tir-  
sa çökê wî recifîn. Ji  
xwe re go ez vê carê jî  
xelas bûm ka heta care-  
ke dî ma xwedê..."

# Ew lawikê ku nedixwest here dibistanê

## Çîrok: Sagor Fran, Werger: Mehabad Kurdi, Ji zimanê Swêdi

Carek li caran rehmet li  
bavê guhdaran, dayîkek  
hebû. Dayîk jî lawikekî  
wê hebû ku nedixwest  
biçe dibistanê.

Dayîk çû cem liqê  
(şaxê) dar (qijûl, hejik) û  
got bo wî: "Liqê dar yê  
xoştivî, li lawik bixe! La-  
wik naxwaze biçe dibis-

tanê." Liqê dar jî got:  
"Na!"

Wê gavê dayîk çû cem  
agir û got: "Agirê xoş-  
wîst, liqê dar bişewtîne!  
Liqê dar naxwaze li la-  
wik bixe, lawik jî naxwaze  
biçe dibistanê." Agir  
got: "Na!"

Piştî çendekî dayîk çû  
cem avê û got: "Ava ber  
dilan, agirê vemrîne!  
Agir naxwaze liqê dar bi-  
şewtîne, liqê dar naxwaze  
li lawik bixe, lawik  
naxwaze biçe dibistanê."  
Av got: "Na!"


Vê carê dayîk çû cem  
ga û got: "Gayê giranbu-  
ha, avê vexwe! Av nax-  
waze agir vemrîne, agir  
naxwaze liqê dar bişewtî-  
ne, liqê dar naxwaze li  
lawik bixe, lawik naxwaze  
biçe dibistanê." Werîs  
got: "Na!"

Dayîk naçar ma ku bi-  
çe cem qeseb (ser jê ker)

ze avê vexwe, av naxwaze  
agir vemrîne, agir  
naxwaze liqê dar bişewtî-  
ne, liqê dar naxwaze li  
lawik bixe, lawik naxwaze  
biçe dibistanê." Mişk  
got: "Na!"

Piştî van tevan dayîk  
çû cem pisîkê û got: "Pi-  
sîka delal, mişk bixwe!  
Mişk naxwaze werîs bi-  
qetîne, werîs naxwaze  
qesab bixenqîne, qesab  
naxwaze ga ser jê ve bi-  
ke, ga naxwaze avê vex-  
we, av naxwaze agir  
vemrîne, agir naxwaze  
liqê dar bişewtîne, liqê  
dar naxwaze li lawik bi-  
xe, lawik naxwaze biçe  
dibistanê." Pisîk got:  
"Na!"

Wê gavê dayîk got:  
"Ezê kaseke şîr bidim  
te!" Pisîk li xoşyan çû  
ser mişk, mişk jî çû ser  
werîs, werîs jî çû ser  
qesab, qesab jî çû ser ga,  
ga jî çû ser av, av jî çû ser  
agir, agir jî çû ser liqê  
dar, liqê dar jî çû ser la-  
wik, lawik jî ji tirsâ canê  
xwe çû dibistanê!"



na min ne yek, lê du za-  
rok anîne!

**HİTLER**  
Pîrejinek  
di kuçekê  
Londre de  
bi rî ve  
diçû. Gure  
gur bi ez-  
manan ke-  
tin. Jinik  
tirsîya û li  
cihekî geri-  
ya ku xwe  
veşere. Ye-  
kî gotê:  
-Xanim

metirse! Ew ne  
Ji bo ci tu du roj de-  
gûregûrên Hîtler, lê yên  
xwedê ne!

Seid Çiyan

**MAMÛR**  
Rojekî jina mamûrekî  
dikir ku biwelide.  
Mamûr çû cem serkarê  
daîre û  
destûr  
(izin)  
xwest.  
Serkarê  
daîre du  
roj destûr  
dayê. Lî  
mîrik piş-  
tî çar roj  
jan vege-  
riya da-  
îre:  
Serkar  
: Destûra te du roj bûn!  
Ji bo ci tu du roj de-  
reng hatî daîre?  
Mamûr: Ez benî, ji-

**Li gundê Aco****Destpêk Rûpel 1**

Cendekên van qızêş şoreşger ji hêla leşkeran ve li gundê Aco tê çal kirin. Qızêş şoreşger ên ku bi birîndarî dikevin destê hêzên dewletê hîna ji wan tu agahdarî nehat stendin. Çapemeniya Tirk jî, weke hercarî dîsa li gor agahdariyê hêzên dewletê manşet avetiñ 'di navbera terorist û eskeran de hevberiya çekdarî derket, 4 terorist hatin kuştin.' Rojnameyên Tirk rastiyen bêrevajî kirin û pêşkêş gel kirin.

Hêzên dewletê, paşa dikevin nav gundê Aco (yolbaşı), li gundiyan işkence dikin, ji gundiyan Adil Kaya, Şafî Demir, Nizam Kaya, Alaettin Kaya û M. Resul Dalan digrin û bi xwe re dibin. Di derheqê van gundiyan de jî tu agahdarî nehat stendin.

**ROJEVA WELËT****Panturkîzm****Destpêk Rûpel 1**

cezma tûranîzm û panturkîzm li gişan xistiye û tev bûne daholanen împeratoriyeke xeyâli.

İmperotorî ji "Adriyatîkê heta bi Sedê Çinê ye û 200 milyon Tirk" berimbêz dike.

Demirel devê wî maye ji hev, girêz jê tê xwarê û heycana wî ne kêmî ya Bartelmi Diyaz, Vasko Degama, Kiristof Kolomb û berî wan Marko Polo ye; dibêje: "Efendîno! min digot qey em van wela tan nas dîkin belê em şaq in. Xwina me, zimanê me dînê me her tişte me yek e. Ev der warê bav û kalêne me ne".

Televizyon û rojnamegeriya resmî bi hûr û girêz xwe ji bo Demirel û Türkçe didin cepikan û ji bo ku nijadperestiyê, tûranîzm û panturkîzm sor bikin û terora li hundîre Tirkîye heye veşerîn tişten nemayî dîkin û dirêsin.

Dewleta Tirk kîrinê xwe li hundir bi diplomasîya li derive û carna ji bi riya peyyê mîna "realîta Kurd", "partiya Kurd" û "televizyon kurðî" dinuxumîne û vedişere.

Ji meha Newrozê û vir de li her aliye Kurdistanê û çend heftêndawî li bajaren Istenbolê, Edenê, Enqere, Bursa û Izmirê dewletê li dijî her mirovê Kurd, demokrat û muxalîf şerekî bê eman vekiriye û ketûber wan digre, dikuje û binco dike. Di vî warî de zîm û zordarîya ûro tê kîrin di destpêka salên 12'ê lîlonê de, di salên 1981 û 82 an de inceq dibû.

Giregir û qerasên dewletê, paşa û generalên deshelatdariya Tirk ci dibêjin, bi xewn û xeyalên çawa dijin û bêhna xwe derdixînin, bi kîfa xwe ne. Rastiye heye. Dewleta Tirk heta bi reng û zora ûro here ser Kurdan û bi devê tifingê ne bi ziman û gotinê, bi wan re qise bike, nikare bêje xwezi bi ûro û di siyaset û diplomasîya derive ji de ne mimkûne bighêje hedef û armancê xwe. Xwirtiya gelê Tirk, mezinbûn û berzbûna gelê Tirk girêdayê çareserkirina pirsa gelê Kurd e. Bi qasî ku iş û karê Tirkan ji Kurdan xerab û ava dibe ji tu neteweyê din xerab û baş nabe. Bi qasî gelên Tirk û Kurd ji hev re lazim in, tu gelên din ewqasî ji hevre nelazim û ne hewcedarên hev in.

Nijadperest, tûranperest û panturkîst berê jî hebûn li Tirkîye û serê gelê Tirk xistin bela û tifaqîn mezin. Qirkirin û vebirînen mezin kirin, ji neteweyê xwe ji û ji yêñ cîran û derdoran ji pîr kes dan kuştin û welatên xwe xistin nav mecerayê nebihîstî. Ûro jî tişte bikin wê ev be.

Belê demokrat, însan û mirovhezîn Tirk bila vê zanibin ku yekîtiya Kurd û Tirkan realîstî û mikuntire ji yekîtiyeke panturkîstî û tûranîstî. Yekîtiyeke 200 milyon "Tirkîn" bela wela her cendekan li derekê û çû têkiliyeke siyasi, sosyal, ekonomikî û kulturî di nav wan de tune, ne mimkune û ji xewneke derewîn û xapînok pêve ku dixwaze mêjiyê xelkê bişo û terora dewletê veşere pêve ne tiştekî din e.

Kurd û Tirk heger ne bê problem û serfes ji be ev hezar sal in ku bi hev re dijin. Jiyana bi hev re ev herdu gel kirine şarezayê hevdû, ji hev re kirine xwedî tolerans û li hev nêzikkirine. Nêzikayî, hevdû nasin û hevdû fêmkirina di nav gelê Kurd û Tirk de heye di nav Tirkeki Enqere û yekî li Almaatayê de tune, nikare hebe.

Riya yekîtiya gelê Tirk bi gelên din 19, girêdayê serketina yekîtiya gelê Kurd û gelê Tirk e.

**Îsal dîbin çavan de****Destpêk Rûpel 1**

li Batmanê Agit Salman ji 26'ê Nisanê li Edenê li taxa Barbaros ji teref hêzên dewletê ve têne girtin. Di ser girtina van welatparêzan de hêja heftiyek derbas nabe, xeber ji malbatê wan re dişeyin bêjin zaroyê we di bin çav de ji nîşka ve nexweşketine, Mehmet Yilmaz terabûye (ketiye) û xwîn rîjîya mejiyê wî, Agit Salman ji qelbê wî sekiniye û mirine.

Li ser van herdu mirinê ku mirov şaq dihêlin û bi aqîlê mirov nakevin, Nizamettin Toğuc van pirsên jêrîn dipirse.

"Yekî li qeta bodromê di bin çav de be, ji mesafeeyeke çiqas bilind û bi ci awayî tera dibe û xwîn dirije mejiyê wî?

Mirovêkî jîndar çawa ji nîşka ve qelbê wî disekine û di cih de dimire? An jî yekî berî bike-

ve bin çav ku tu problemen wî yêñ jîndarî (sihhî) tune bin çawa ji nîşka ve nexweşiyekî wi-sa xeder digre, yanê xwîn dirije mejiyê wî?"

Toğuc pirsên xwe wiha di domine: "Dewlet ji jiyana wan kesen dixe bin çav, berpirsiyar (mesul) e an-na? Kê tesbit kiriye ku Agit Salman bi krîza qelbê xwe miriye?"

Ji bo mirina Mehmet Yilmaz ji dipirse: "Dema Mehmet hil dane nexweşxanê, ew baş ameliyat kîrin an na û ji teref Kîjan desthilat (yetkili) an hate ameliyat kîrin?"

Parlamente û serbixwe van pirsên daxwaznameya xwe di qedîne "Pişî mirina van kesan lêpirsîna cinayetê çêbû an na? Careke din hûn otopsî li ser bedena van mirovîn mirî çenakin û neticeya otopsiyan ji malbata wan re naşeyin?"

Dema girtiyen di bin çav de nexweş dikevin hûn xeber di din malbatê wan an na?

Ji destpêka sala 1992 û heta niha çend kes di bin çavan de mirine?"

**Êrîşen hêzên rizgar...****Destpêk Rûpel 1**

Di vê hevberiyê de 3 eskerên komando hatin kuştin, 6 esker ji birîndar bûn. Gerfillayê ARGK ê de şereke dijwar û dirêj derket û ev şer 3 roj domand. Grubeke biçûk a gerilla li hemberî 2 hezar esker, tîmîn taybetî 6 firok û 10 panzeran şer kir.

Di vê lihevdanê de, gerfillayê ARGK ê, lehengiyen (qehtemani) mezin nîşan dan. Di vê lihevdanê de, ji hêzên dewletê kîmtirîn 7 kes hatin kuştin û bi dehan jî birîndar bûn; 6 gerilla jî şehîd ketin.

Piştî ku operasyon diqedede, hêzên dewletê dikevin nav gundan, li gundiyan tadayî dikin û ji gundiyan çend kesan jî bi xwe re dibin. Hêzên dewletê di dema operasyonê de ji gundiyan çend kesan jî bi xwe re dibin. Hêzên dewletê di dema operasyonê de ji gundiyan çend kesan dikujin, cendekîn wan ji weke gerfillayê kuştî didin nîşandan. Çapemeniya Tirk vê rewşî li gor xwestuna dewletê bêrevajî kir û belav kir.

hat kuştin û birîndar kirin.

Li Çewlikê navçeya Solxanê, roja 3'ê Gulanê di navbera hêzên dewletê û gerfillayê ARGK ê de şereke dijwar û dirêj derket û ev şer 3 roj domand. Grubeke biçûk a gerilla li hemberî 2 hezar esker, tîmîn taybetî 6 firok û 10 panzeran şer kir.

Di vê lihevdanê de, gerfillayê ARGK ê, lehengiyen (qehtemani) mezin nîşan dan. Di vê lihevdanê de, ji hêzên dewletê kîmtirîn 7 kes hatin kuştin û bi dehan jî birîndar bûn; 6 gerilla jî şehîd ketin.

Piştî ku operasyon diqedede, hêzên dewletê dikevin nav gundan, li gundiyan tadayî dikin û ji gundiyan çend kesan jî bi xwe re dibin. Hêzên dewletê di dema operasyonê de ji gundiyan çend kesan jî bi xwe re dibin. Hêzên dewletê di dema operasyonê de ji gundiyan çend kesan dikujin, cendekîn wan ji weke gerfillayê kuştî didin nîşandan. Çapemeniya Tirk vê rewşî li gor xwestuna dewletê bêrevajî kir û belav kir.

Di van salên dawiyê de, bi taktikîn cenga taybetî, bersîva daxwazîn gelê Kurd û ji bo azadî û demokratîkî tê dayîn. Gelê me bi azîneyen (metodîn) leşkerî tê çewsandin û pelixandin. Şovenîzm tê kûr kirin. Di nava gelên Kurd û Türk de dijminahî tê çinandin. Ev pêşveçûn tev, xwirtkirina birayetiya gelên Kurd û Türk girîngitir dikin.

Bi armanca şeva me, cemhevanîna gelên Kurd û Türk li ser bingehêke aza û wekhevî ye, pêşvebirina zanabûna di vê pîrsî de ye, bas tê zanîn ku, di dîroka komara Tirkîye de, bi zagonê şovenîstî kesanîya neteweyî û çandiya gelê Kurd bi carekê hatiye îñkar kirin û ev rastiyekê eskere ye.

Tirk, dibêje "Em li hemberî PKK û şer dîkin", lê li gor prensîbîn cengê nalive, sivîlan dikuje, mirovan direvîne, işkence dike û dest davêje xîreta xelkê. Dewlet, van hovîtiyan dike, çapemeyînia Tirk jî, van hovîtiyan vedişere û rastiyen bêrevajî dike, gelê Tirk dixapîne.

Di bangê de tê gotin ku hêzên dewletê, bi gerfillayê ARGK û re nikarin şer bîkin, îca hêrsên xwe ji Kurdîn sivîl derdixin. Dewleta Tirk, nikare pêsiya pêşveçûna têkoşîna rizgariya neteweyî Kurd bigre. Gelê Kurd ûro bi milyonan serhîdide, li xwe û li partiya xwe xwedî derdikeve, ji bo serxwebûn û azadiya xwe diçer ser mirinê. Ev jî çavê dijmin ditîrsîne. Ev tîrs dewletê hovtir dike. Tehemûla dewletê ji Kurdîn azad û xwedî rûmet re qet nîne. Di dâwiya bangê de ev gazî cih digre:

"Em bangî hemû gelên

**Şeva Yekîtiya Keda Gel a li Ewrûpa**

Yekîtiya Keda Gel a li Ewrûpa 23'ê Gulanê saet 16.00 an li Stokholmê di salona SolnaHallen de bi navê "ji bo jiyanek aza û biratî tev bi hev re" şeveke şahîyê çedike.

Di bermameya (programa) vê şevê de hejmarek dengbêj, komikîn muzikî, ekibê folklorê û piyesek cih digre. Dengbêj û komikîn muzikî ev: Koma Sîrvan, Ganî Nar, Nûlifer Akbal, Dilovan, Zozan, Koma Berkwedan, Nasir Rezazî, Beşîr Botanî, Kiçki

**Bang ji mirovahiyê****Destpêk Rûpel 1**

Dîlên PKK û yên di girtîgeha Entabê de, bangekî belav kirin. Ev bang, ji bo hemû mirovîn dînyayê ye. Alî-girêne PKK û yên dîl, di vê bangê de terora dewletê ya li ser gelê Kurd dihînen zimên. Bi taybetî jî, li ser vebirînen (qirkirîn) hêzên dewletê, yên di Newrozê de, li Bismil, Stewr û Kerboranê de bûbûn radiwestin û van qirkirînan protesto dikin. Di bangê de pasverûtî û kevneperestîya Berzanî û Telebanî tê şirovekirin, pêwendiyen van xwefiroşan û bi dewleta Tirk re tê diyarkirin.

Di bangê de: "Dewleta Tirk, bi her awayî û bi hemû hêzên xwe ve, ji bo ku şoreşa Kurdistane bifetisîne, diçer ser PKK û; di vir de, hêzên otomoniwxaz, feodal, kevneperest, xwefiroş, noker û xayîn û Kurd û hêzên emperialist jî, dixe dewreyê. Anku bikar tîne. Dewleta

dinyayê dikin, li hemberî hovîti û qirkirîn dewleta Tirk derkevin. Mafê gelê Kurd jî heye ku çarenivîs (qeder) a xwe hilde destê xwe û weke neteweyen din azad û serbixwe bijî. Qetliamîn ku li ser gelê Kurd tê meşandin, ne tenê rûresîya Tirkîye ye, ev rûresî ya hemû dînyayê ye."

**Hêzên dewletê Kurdê****Destpêk Rûpel 1**

Divê pêsiya vê hovîtiye bê birîn."

Dewlet, berê Kurdîn welatparêz û sivîl bi desten kontran (kontrgerilla û Hizbî Kontra) û bi şewyeke veşartî dida kuştin; lê niha êdî hewce nabîne, bi vekirî û eşkere dide kuştin.

Dewlet dixwaze ku gel bitîrsîne, wî ji meşa azadiyê vejetîne û piştigiriya wî ya bi PKK û re qut bike. Ji ber vê yekê jî terora xwe ya li ser gelê Kurd zedetir dike.

# Mele Evdila keleporekî têkoşîna rûmetê ye

● Ji wesiyetên wî ya mezintir ev bû: Efûnekirina serokatiya kevnepresten neteweyî. Liva wî ya radikaltîrin û ragirt ev bû digot, divê pêdiviyen vê dîtinê werin bi cih anîn. Li derveyî van, baweriya xwe gelek bi xeta şoreşê dianî. Di têkoşîne de serkevtin û serfiraziye didit û ji lewre jî gelek rihet û bi aram bû

## Nedim Dara

Mele Evdilayê Timoqî, geleki zorê dida xwe, da dernekeve derveyî çarçova ferman û direktifan. Di vê pirsê de gelekî bi bal û balkêş bû. Leşkerekî wiha bû, ku her keliyeke wî li keliya wî ya dinê li hev dihat. Bi vê rewşa xwe, Ew bi xwe jî gelek watar bû. Bi vî rengî tevlî têkoşîne bûbû. Ji lew re ne bes e, gava mirov bibêje ew dostekî şervan û pêşengê serxwebûn û azadiyê bû. Rojîn jiyana xwe yên dawiyê pêşkeshî baweriyeke müftan kiribû û bîryara xwe rast dabû.


Bi vê jî nema. Xwe berda nava gelê Kurd jî. Gelek ci-vîn ji bo gelê me çêkir. Li başûrê-rojavayê welêt. Kurdeki wî nasneke, nîne. Her kesê wî nasdiye jî, wî pîroz qebûl kiriye û bi pîrozî jî baweriya xwe bi wî aniye, xwe bi wî girêdaye. Ew bi xwe jî pîrr baş zaniye, ku bibe xwe-diyê posfeyen (tesîrîn) mezin. Pêwîsiya li cihekî mayînê jî pîrr baş dizanî. Pîrr bi dilê wî bû, ku partî dikare bi serbestî xwe li başûrê-rojavayê welêt jî bilivîne. Buhabûnekê dida vî tiştî. Ji ber vê yekê digot, ku ev rewş gelekî baş e, divê mirov baş sûdan (feydeyan) bistîne. Tecrûbeyen wî yên dîrokî hebûn. Bawer dikir, ku ev rewş,ango derfeta liva bi serbestî, wê bibe bingeha pêşveçûneke mezin û wê bîke ku azadî nêziktir bibe. Bîrû baweriye wî wiha bûn û wiha jî man. Armanca dilê wî bû, ku heya Newroza 1992'an di jiyanê de bimîne. Serok digot, "Ber bi sala 2000 an ve emê xwe bigihîn rizgariye..." Wî digot, "Heke ber bi sala 1995'an ve, ev bibe, wê çetir be". Lê di rastîniye de Ew dixwest daxwaza dilê xwe bîne zimên, ji ber ku bawer dikir, heya vê salê dikare di jiyanê de bimîne. Çavên xwe berdabû vê salê û dixwest heya hingê welatekî serbixwe avabibe.

Di nava gelê me de kalê

wekî wî gelek in. Pirraniya wan, piştî çend salan wê koçbikin, temenekî wan ê dirêj nema ye. Lê kesek ji wan wekî wî nabêje, "Ez dixwazim bi çavên xwe rizgariye bibînim". Ew bi vê hêviyê ji-yana xwe didomand. Helbet kalêne me yên bi vê hêviyê gelek in. Dema hilgavtina 15'ê Tebaxê destpêkir, kalêne me yên li Botanê gotin, "Xwezî bi me ku me van rojan jî dît". Digotin, "Heke ji mirina me re çend rojek mabin jî, em gelekî dilxwes in, ku me van rojan dîtine. Ji niha û pêve mirin were jî ne xema dilê me ye". Niha jî gelek kalemêrên me hene, dibêjin, "Ji temenê me re çend sal mane, êdî em dixwazin serfiraziya vî karî bibînin." Belê, kalêne vê livê şanîdikin hene.

Ew melayê me yê dîrokî, rîberê hêviyeye wiha bû. Lê weke ku nikare welatê avabûyî bibîne, di nava tirs û endişeyê de bû. Nexusim bi heq jî bû, ji ber ku temenê wî xwe nêzîkê 100 salan kiribû û her keliyekê dilê wî dikarî bisekine. Lê dîsa jî dixwest gelek ciwan bimîne. Gava dilê wî sekînî, di destê wî de misin hebû. Li ser lingan disekînî û dixwest di meşîna xwe de jêhâti be, xweragirt be. Nedixwest bibe barê çi kesekî. Tenê bi serê xwe di eywanekê de dima û dixwest bi xweragirtina xwe hîma xwe ya ji bo jiyanê raber bîke. Dida şanîkirin, ku bi müftanvanî diji.

Ji wesiyetên wî ya mezintir ev bû: Efûnekirina serokatiya kevnepresten neteweyî. Liva wî ya radikaltîrin û ragirt ev bû digot, divê pêdiviyen vê dîtinê werin bi cih anîn. Li derveyî van, baweriya xwe gelek bi xeta şoreşê dianî. Di têkoşîne de serkevtin û serfiraziye didit û ji lew re jî gelek rihet û bi aram bû. Li beramberê mela û oldarên sexte, bi nifrîn û gîrtî dagirtî bû. Di rojîn ji-yana xwe yên dawiyê de, gava rûberê hinde melayen bê



Mele Evdila, bi Serokê PKK ê Abdullah Ocalan re

xêr dibû, hêrs dibû û nedikarî xwe bigire. Tê gotin, ku ji ber vê rastiyê gelek bêhnteng dibû û belkî jî tesîra vî tiştî li mirina wî bûye. Bi eşkereti û di dilê xwe de, li beramberê paşverûtiya olî û sextekariya bi navê olî, têdikoşî. Li gora xwe şerê paşverûyan dikir. Ji vir jî mirov dibîne, ka xwe-diyê şexsiyeteke çawa bû. Şexsiyeteke wiha bi rûmet, di destpêka salê de ji nava me koçkir û tevlî şehîdên niştiman bû.

Bîranîna Mela Evdila mîna bîranîna şexsiyeteke dîrokî ye, bi rastî, keleporeke dîrokî bi xwe ye jî. Carinan em ji xwe dipirsin û dibêjin, "Geloma keleporekî dîrokî ya me Kurdan heye?" Bersiva vê pirsê ev e: Belê heye û ew jî ev e kesen weke Mela Evdila û rûmeta wan e. Şex Seîdê Pîranî jî yekî wiha ye. Gava Ew ji 70 salan derbas bûbû, bi dar ve hate hejandin. Seîdê Rizayê Dersimê jî ji darê kendirê derbas bû

xwe dipirsin û dibêjin, "Geloma keleporekî dîrokî ya me Kurdan heye?" Bersiva vê pirsê ev e: Belê heye û ew jî ev e kesen weke Mela Evdila û rûmeta wan e. Şex Seîdê Pîranî jî yekî wiha ye. Gava Ew ji 70 salan derbas bûbû, bi dar ve hate hejandin. Seyid Rizayê Dersimê jî ji darê kendirê derbas bû. Ma ev kes ji keleporekî re ne bes

in? Mela Evdilayê dîrokî bi tune ne. Taybetiyen mirovahî serdest in. Ji kîjan olî, rîdarî bin bila bin, her mirovek dikare bi serbilindî cihê xwe di navâ van rîzan de bistîne. Ev kûraniya kapasîteyekê şanî dike. Sosyalizm bi xwe jî bi vî awahî xwe digihîne nîrxên bilind û buha.

Nêzîkbûna rast di pirsa dînî de, di bûyerên şehîdên me de, xwe gihandîye wateyeke mezin. Di meşike jêhâtî de sosyalizm jî bi cih tê. Şehadetîn mezin jî dibin naveroka wateyeñ mezin. Ev jî şanî dîkin, ku li welatê me tiştîn rast dibin.

Em dixwazin careke din bîbêjin, bi vî rengî em girêdayê bîranîna şehîdên welatê xwe ne. Heya dawiyê emê di riya şehîdên xwe de bimeşin, ji bo em bikaribin di rizgariya neteweyî ya gelê xwe de, di rizgariya neteweyî ya gelên Rojhilata Navîn de, di tevgera azadiya cihanî de û di rizgariya mirovahî de rola xwe bileyizin. Heke em bixwazin rola xwe baş bileyizin, divê em girêdayê prensibîn şehîdan bi berdewamî bimîn. Pratîk wiha dikare were pêşvebirin. Ev jî wê me bigihîne serfiraziye mezin, serkevtinê pîrozî. Li ser vê bingehê em dibêjin, ku bîranîna şehîdên me ronahiyeke her heyînî ye. Şehîdên me serleskeren liv û çalakiya me ne!